PolitikART

KOVARA MEHANE YA WÊJE HUNER Û RAMANÊ

07 Sibat 2026 Şemî

HEJMAR : 347

Şoreşa Welatparêziya Kurdistanê

Rojava Rojhilat e

Kurdistan yek welat e

Di vê hejmara PolîtîkArtê de em bi rewşa li Rojavayê Kurdistanê dadikevin. Luqman Guldivê çavdêriyên xwe yên li Rojava di dema êrişên topyekûn ên desthilatdariya HTŞ'ê ya li Şamê de nivîsîn. Ew nexasim jî seferberiya xelkê Rojavayê Kurdistanê û hestên yekîtiya neteweyî û welatparêz ên xelkê Kurdistanê derdixe pêş. Di nivîseke din a li ser destana Ehmedê Şeng de Luqman Guldivê berê xwe dide têgeha sînorê di navbera Dodikiyên Kurd û Gêsanên Ereb de. Ew balê dibe ser wê yekê ku Çiyayê Evdilezîzê yê li Hesekê mekanekî sînor e û sînor di destanê de weke mekanekî danûstandinê hatiye avakirin. Gava Gêsan mêvan bin, Dodikî miameleya mêvan bi wan re dikin, gava dibin diz û talanker dibin neyar û gava kuştinê dikin jî dibin dijmin. Ev destana kêm tê nasîn, destanek e li ser têgeha sînor a di navbera eşîrên Kurd û Ereb de. Xwendekarê Zanîngeha Kobanê Fetah Îsa jî bi gotara nefretê ya li dijî Kurdan dadikeve û nimûneya wî hesabekî facebookê ye. Bi rêya vî hesabî ew nîşan dide ka çawa nefreteke giran li dijî Kurdan li Sûrî tê belavkirin. Mamosteya Zanîngeha Kobanê Firyaz Berkel bi wê yekê dadikeve ka mirov çawa xwendekaran teşwîq bike da ku di nava çalakiyên li kampûsa zanîngehê de cihê xwe bigirin. Xwendekara Zanîngeha Kobanê Nadiya Hisên jî bi meseleya şideta devkî li dibistanan daketiye û berê xwe daye xwendekarên pola 9'an ên li Kabanê. Xwedenkara Zanîngeha Kobanê Dilber Umer bi bûyereke dîrokî, şerê Bedirxan Begê li dijî Seîd Begê Dasinan daketiye û bêdengiya di nava wêjeya devkî ya Kurdî de ya beramberî vê bûyerê şirove dike. Berdevkê KCK'ê Zagros Hîwa jî ji bo me rewşa dawî ya li Îranê nexasim jî Rojhilatê Kurdistanê nirxand.

PolitikART

Herausgeber: *Medya Presse-und Werbeagentur GmbH* Frankfurter Str. 181, 63263 Neu-Isenburg **Geschäftsführer:** Ahmet Yücedağ **Ver. Redakteur:** Özlem Cakar politikart@yeniozgurpolitika.org

Yek e yek e yek e gelê Kurd yek e

Luqman GULDIVÊ

Beriya vê êrişa qirkirinê, li Silêmaniyê ez bi kê re dipeyivîm, digot, hêviya me Rojava ye. Ev êrişa li dijî hêviya wan, ew jî seferber kiribûn. Herî zêde ya cihê kêfxweşiyê jî ew e ku bandora Birayên Misilman yanî tevgerên 'ixwanî' yên bi piştgiriya ji Tirkiye û ji Qeterê li Başûrê Kurdistanê şikest.

Piştî çend mehan dîsa li Hilêliyê me. Hilêliyê yek ji taxên Qamişloyê yên herî welatparêz e. Zanîngeha Rojava jî li vê taxê ye, zanîngeha ku xwendekarên min lê dixwînin. Li duriyan û çarriyana dîmenên seferberiyê hene. Hê Hilêliyê û temamê Qamişloyê evqasî seferber nebûbû. Her komun û her tax bi ciwan, gihiştî û navsereyên çekdar ên ku taxên xwe kolanên xwe diparêzin tijî ye. Xelk jî vê rojê bi alayên xwe yên rengo rengo, ji alaya Tev-Demê heta bi yên YPG û YPJ'ê, ji alaya herêma Kurdistanê heta bi rengên kesk û sor û zer, li meydanan, li duriyan, sêriyan û çarriyanan pişta van xwebexşên seferberiyê digire. Li dijî wê tirs û xofa ku hêzên çete yên bi fermandariya Şamê dixwestin bixin dilê gel, ew bi mihrîcaneke xweparastinê bersivê didin: Mihrîcana Serketina Welatparêziya Kurdistanê belkî jî Mihrîcana Şoreşa Welatparêziya Kurdistanê. Bi hezaran kes li Qamişloyê tevlî seferberiyê bûne. Hîna min ti carî şahidî li ev qas çekdarên nava bajaran ên xwebexş nekiribû. Brahîm ê li cem min, dibêje, "Em xwebexş in, lê em neçar in xwebexş jî bin. Divê em zarokên xwe, malbatên xwe û kerameta xwe biparêzin. Em çawa bihêlin ku talanên me rakin!".

Hêza yekîtiyeke berê nedîtî hişt ku ji xwe bipirsim, gelo Kurdan toqa wê bêbextiya bêtifaqiyê ya di stûyê xwe de şikand? Hêvîdar im ku wan ew toq şikandibe. Hêviya xelkê jî ew e ku Şoreşa Welatparêziya Kurdistanê bi ser bikeve. Dînekî Hilêliyê heye, berê jî bi çend alayan digeriya, alaya ku li ser wêneyê Abdullah Ocalan û ya li ser wêneyê Mesûd Barzanî jî heye di destê wî de ne. Ji bilî wan, alayên YPG û YPJ'ê jî pê re ne: "Yek e, yek e, yek e, gelê Kurd yek e". Ew hin dijûnan jî dike, ne yên nû, lê li rewşa dînbûna wî tên û xelk lê nagire.

Kî li dora van şervanên xwebexş e? Kal û pîr, jin û mêr û ciwan û zarok, xweş û nexweş, hema her Kurda/ê li Qamişloyê! tevahiya Kurdên bajarên Rojavayê Kurdistanê pişta seferberbûyiyên xwe digirin. Li cebhê hin ciwanên Rojavayî yên ji Ewrûpa û Başûrê Kurdistanê yên xwedî tecrûbeya şer jî hebûn, lê nexasim ciwanên Başûr yên hatin moralê xelkê bilind kirin. Êdî di nava xelkê de bûye weke sloganeke nû: Moral hezar e!

Lê vê hevgirtinê xwe disipart êşeke mezin ya berê nedîtî. Di vekişîne ji Dêr Hafir û Meskene de êrişa dema vekişîna li gorî lihevkirinê, bû armanca çeteyan û aliyên xiyanet bi hêzên Kurd re kirin. Vê yekê rê li ber koçberbûna bi dehhezaran kesan vekir û ez ê paşê kite bi kite behsa hin şahidî û bûyerên elaqedar bikim, gava ez behsa serdana xwe ya Nexweşxaneya Şehîd Xebat bikim.

Xalo wêneyê min bigire!

Bi herhalî seferberiya li tevahiya bajarên Kurdan, herî baş xwe li komuneke Hilêliyê nîşan da. Xelkê komunê agirê xwe di nava fiçiyeke teneke de pêxistibû, jin û mêr, kal û pîr, ciwan û zarok diçûn û dihatin vî cihê nobetê. "Em ê heta dawiyê taxên xwe biparêzin", slogana wan a sereke bû. Piştî komkujiyên li Heleb, Dêr Hafir, Tebqa û Reqayê, baweriya xelkê tenê bi sîlehên wî tê û xelk dibêje, heta dawiyê ew ê xwe biparêze. Ez ne weke rojnamevan çûbûm, ji ber wê min wêne negirtin, lê min tenê wêneyek girt. Keçeke piçûk 3-4 salî hat cem min û got, xalo min teswîr bike, li cem wê jî kurekî 7-8 salî hebû yê ku alayeke herêma Kurdistanê rakiribû. Min wêneyê wê girt, lê gava li min dinihêrî, xemgîniyeke nediyariyê yan jî belkî westa seferberiyê ya wan çend rojan di rûyê wê de jî diyar bû. Jixwe, jineke li taxê jî eşkere got, "heta sibehê em bi nobetdarê xwe re şiyar in tevî zarokên xwe. Em çayê, qehwê ji wan re tînin, em xizmeta lazim dikin."

Li cem wan xortikek hebû, ez pê re bi Kurmancî peyivîm:

- Em Kurd hemû bûne yek.
— Erê wele, wilo ye.
- Gelo Ereb jî hene di nav me de.
— Nizanim, ez dibê, nînin.

Brahîm ê li cem min, hêdîka keniya. Xêr e? Tu nabêjî, hevalê wî yê zaroktiyê ye û ji dema seferberiyê û vir ve ew jî di nava wan de ye, hem nobetê digire û hem jî dizane ji bo Kurdan ev meseleya man û nemanê ye. Lê ew bi eslê xwe ji Erebên eliyê Til Hemîsê ye. Li nava Kurdan hatiye dinê û weke wan rabûye. Tirs û xofa wan û man û nemana wan, yên wî ne jî, ew jî weke cîranên xwe hîs dike. Li bereya Sefa minê ev Erebên Rojavayê Kurdistanê çêtir nas kiriba: Xwe tevayî Kurdan dikin.

Birîneke giran jî li Başûr dikewe

Ev seferberî li Başûrê Kurdistanê jî hebû. Beriya biçim Qamişloyê, ez li Silêmaniyê bûm û ruhê seferberiyê yê li Silêmaniyê bê mibalexe di dîroka piştî 2003'yan û vir ve cara ewilî bû ku evqasî kurdewar û evqasî zindî bû: Ruh bi Kurdbûna başûr hat. Sedemên vê yên jeopolîtîk û civakî gelek in, lê ez ê van sedeman bi hevokekê îfade bikim. Beriya vê êrişa qirkirinê, li Silêmaniyê ez bi kê re dipeyivîm, digot, hêviya me Rojava ye. Hêviya li Başûrê Kurdistanê hem ji bo elîtên rêveber û hem ji bo xelkê Rojava bû. Ev êrişa li dijî hêviya wan, ew jî seferber kiribûn. Weke dostekî gotî, du nifşên din ên Başûrê Kurdistanê ji nû ve hatin ser xwe û bûn parçeyekî neteweya xwe. Herî zêde cihê kêfxweşiyê jî ew e ku bandora Birayên Misilman yanî tevgerên 'ixwanî' yên ji Tirkiye û ji Qeterê li Başûrê Kurdistanê şikest. Yek ji birînên Kurdan û Kurdistanê dikewe û rehet dibe.

Fermandar Gîvara û 2000 komandos

Ez li Hesekê çûm Hepsa Sinaî ya ku girtiyên DAIŞ'ê lê ragirtî bûn. Li aliyê me yê çepê, li wî aliyê dîwêr, avahiyeke çar qatî xuya dike, li kêleka wê avahiyeke din heye ku qulo-pilo ye. Ew avahî ji avahiyên kevin ên hepsê ye. Gava çeteyên DAIŞ'ê sala 2022'yan ji derve ve êriş birin ser vê hepsa li taxa Xuwêran a li Hesekê, çeteyên li hundirê hepsê jî serî rakiribûn û di şer de tevahiya avahiyên hepsê hilweşiyabûn. Tenê ev avahiya qulo-pilo li ser piyan maye, lê nayê xebitandin. Avahiya çar yan jî pênc -ji ber dîwarê di biwarê de baş nizanim- qatî piştî 2022'yan hatiye çêkirin. Li hepsê qederê 7 hezar DAIŞ'iyan hene. Li serê banê avahiyê Emerîkî tevî alaya xwe bi cih bûbûn û haziriyê vekişandina çeteyên xwe yên DAIŞ'ê dikirin. Dûyekî stûr carekê ji avahiyê çû, heval Brahîm ê ji YPG'ê -Brahîm gelek in li Rojava- gava em ji hepsê veqetiyan wê ji min re bigota, "betanî û cil û bergên wan -DAIŞ'iyan- dişewitînin".

Heval Gîvara fermandarê 2000 komandosê li derdora hepsê ye. temenê wî 29-30 sal in, yanî weke generalekî ciwan e. Wî got, "Xiyaneta wan hîç xem nake, em dizanin ew zilamên berjewendiyên xwe ne. Lê bênanûxwêbûna wan, em ê ji bîr nekin." Ez xweşik berneketim, lê wî paşê ta bi derziyê ve kir: "Carê me bi hev re nan dixwar, silav li hev vedigerand. Em Kurd bi kê re nan bixwin, em xatirê wê nanxwarina bi hev re ji bîr nakin.

Fermandarê komandos Givara: Xiyaneta Emerîkiyan hîç xem nake, em dizanin ew zilamên berjewendiyên xwe ne. Lê bênanûxwêbûna wan, em ê ji bîr nekin. Em Kurd bi kê re nan bixwin, em xatirê wê nanxwarinê ji bîr nakin. Lê ev eskerên Emerîkî yên ku me heta doh bi hev re nan dixwar, niha ava me jî venaxwin.

Lê ev eskerên Emerîkî yên ku me heta doh bi hev re nan dixwar, niha ava ku li avahiya wan heye jî venaxwin. Helîkopter avê ji wan re tînin datînin ser ban û hewşa hepsê."

Hevkariya di şerê li dijî DAIŞ'ê de jî li gorî fermandar Gîvara êdî bi temamî nemaye. Ew dibêje, tevgera şaneyên DAIŞ'ê heye û hêzên Koalîsyonê û nexasim ên Emerîkayê vê tevgerê dibînin û dişopînin, lê êdî ti agahiyê bi wan re parve nakin.

Kenekî sivik li ser rûyê fermandar Gîvara e. Ji me re dibêje, çeteyên DAIŞ'ê ji hepsan werin vekişandin, komandosên wî jî wê rehet bikin, karibin di şerê li dijî Kurdan de miletê Kurd biparêzin. Di nava şervanên wî de Ereb jî hene, ji ber wê gava dibêje "şerê li dijî Kurdan" berê xwe da yekî ji wan û bişirî. Ew jî pê re bişîrî. Her kes dizane, ev şer ji bo Kurdan ên man û nemanê ye.

Hena neviyê Henayê Heydo ye!

Roja beriya wê min li Qamişoyê Hena dît, fermandarekî hêzeke piçûk a YPG'ê yê bi eslê xwe Suryanî. Li gorî dibêje, ew ji neviyên fermandar û destbirakê Elîkê Betê, Şemûnê Hena Heydo ye. "Ji zarok mezinan, me hemûyan rahiştiye tivingê. Êdî mesele xîreta me ye. Em û ew in". Suryaniyekî gava digot, "em û ew in", xwe tevayî Kurdan dikir. Gelek Erebên Rojavayê Kurdistanê jî êdî di vî şerê man û nemanê de xwe tevahiyê Kurdan kirine.

Ev "em û ew in", li seranserê bajarên Kurdan ên devera Cizîrê dihat gotin. Em dîtira rojê çûn xeta cebha pêş jî, li ser bereya şer a li rojavayê Til Berek û Rojhilatê bajarê Hesekê. Fermandarê nuqteya em lê Gewran jî Suryanî bû: "Xeta di navbera me û wan de gundên Kurdan in û çend gundên Ereban jî li aliyê me hene." Wê kêliyê du helîkopterên Emerîkî di ser me re firiyan. Piştî wê, balefirek firiya çû. Lê wê balafirê kêliyekê rê li ber kelecan û hereketekê vekir: Gelo droneke Tirkan e?

Ew ne drona Tirkan bû, lê droneke Tirkan jî hebû. Çawa dîtibû ku çûnûhatin li wê nuqteyê çêbû, xeber dabû çeteyan û çeteyan jî bi dronên xwe li wê nuqteyê xist, yek ji şervanên Ereb ê li nuqteyê birîndar bû. Nûnerê ragihandinê yê bi me re em ji cihê êrişê dûr xistin.

Komkujiyên mezin û penaberiya pirrcarî

Ez ê paşê li cebhê vegerim, lê bêyî êşa dijminahî û xiyanetê bi Kurdan re çêkiriye, em nikarin li hestiyariya neteweyî û yekbûnê ya Kurdan serwext bibin. Em li dibistaneke nêzîkî navenda bajêrê Qamişloyê ne, hema sed metreyekî dûrî Mizgefta Zeynel Abidîn a Qamişloyê -li Nisêbînê jî bi heman navî mizgeftek heye- ye. Di refekî dibistanê de bi dehan kes rûniştine, tevî zarokan. Elektrîk ji dema ku Şamê bendav xistine destê xwe û vir ve, qut bûye. Gava em hatin, xêrxwazekî mazot şandibû da ku penaber xwarina xwe pê çêkin û xwe pê germ bikin.

Em li refê li ser merşekê rûniştin. Berdevkê komuna penaberan agahî dan me: 497 penaber li vê dibistanê dimînin bi giştî 99 malbat. Tevahiya dibistanên Qamişloyê bûne stargeh ji bo penaberên ku ji Tebqa û Reqayê koçber bûne. Li hinekan jî penaberên ji kampa Waşokanî ya Hesekê bi cih bûne. Penaberên ji Serêkaniyê yên li kampa Waşokaniyê, ji ber ku xwe ewle hîs nekirine, hinek jê li dibistan û mizgeftên Qamişlo bi cih bûne.

Her kes herî kêm du caran penaber bûye, lê hinek jê ev cara çaran e ku penaber dibin. Ew penaberên ji ber dagirkeriya Tirkiyeyê ji Efrînê filitîne, pêşî li Şehba, paşê li Tebqa û niha jî li Qamişlo û Dêrikê bi cih bûne.

Şervanan canê xwe feda kir

Jineke ji Efrînê ya kezebşewitî behsa kêliyên komkujiyê dike: "Ji her deverî ve êriş birin dbistana em weke penaber lê bi cih bûbûn. Hucreyên veşartî û hêzên hikûmetê bi hev re. Qiyamet bû li ser serê me. Me derî li ber xwe girtin û xwe di dibistanê de asê kir. Piştî sê saetan wan êdî xwe ji dîwaran qevazt û derî jî şikandin. Wê kêliyê heval bi me ve gihîştin, rêyek ji me re vekirin. Ji wan hevalan 8, gava ku em xilas kirin, şehîd bûn. Di rê de jî gelek heval û xelkê sivîl şehîd bûn. Du seriyên jêkirî yên ku sîx di guhên wan de çikandî di deriyê ketina Tebqayê de bi cih kiribûn, yên jinan bûn. Tade û eziyet li sê cenazeyan jî dikirin."

Ew di romorkekê de ye û serê wê romorkê bi kon yan jî çadirekê girtiye. Ji ber ku dilê wê dixele ji neçarî serê xwe derxistiye û şahidî li van bûyerên li ketina bajarê Tebqayê jî kiriye.

Lê ew ne tenê ye. Li Kampa Newrozê ya li Dêrikê jî Ehmedê ji Efrînê ji me re got, gava ew ji Reqayê veqetiyaye, çeteyan ew sekinandiye: "Kêr danîn ser sînga her du zarokên min ên 5 û 6 salî. Ji me re gotin, em dizanin hûn Kurd in û em dizanin hûn bi ku ve jî diçin. Em ê bên û we li wir jî bikujin. Zarokên min di van konên her roj av dide bin, bi şev şiyar dibin û dipirsin, gelo hatin bavo?"

Li Nexweşxaneya Şehîd Xebat a li Qamişloyê jî yekî ji birîndaran got, "Ez bi van birînên giran filitîm, lê hê jî haya min ne ji hevjîna min ne jî ji du zarokên min heye". Birîndarên esker jî behsa wê yekê dikin çawa bi xiyanetê û kemînên dema lihevkirinê gelek ji wan birîndar kirin û gelekên din şehîd kirine.

Şerê li Rojavayê Kurdistanê ji ber vê yekê, eşkere şerekî man û nemanê ye, hem weke şerê çekdarî û hem jî weke mizakereyên bi hikûmeta navendî re.

Şervan hemû fedayî ne

Li Hesekê em bi Berdevkê YPG'ê Siyamend Elî re peyivîn. Wî jî got, êdî ew li Rojava ne, vekişiyane erdên Kurd lê pirranî. Ew ê nuqte bi nuqte gund bi gund şer bikin. Wî got, ew jî pê dizanin ku ev şer ê man û nemana gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê ye.

Piştî şerên giran ên li gundê Sefa yê ser bi Çilaxa ve me berê xwe da Çilaxa jî da ku em karibin herin ser xeta bereyê ya şer. Lê şer, ne şerê caran e. Em nikarin xwe bigihînin bereyê. Li nava bajêr, me xwe bi rengekî xist bela serê çend şervanan. Wan em birin nuqteyekê ku lê qederê 10 şervan hebûn. Şervan hemû berê wan li xeta bereya şer e. Tevî ku hinek jê birîndarê şerê wan 3-4 rojan jî bûn, li bendê bûn vegerin bereya şer: "Ev der xaka me ye. Lazim e em bi tevahiya hêza xwe biparêzin. Ev çete dikevin ku talanê radikin, kerameta xelkê binpê dikin". Miheme, ev gotinên xwe qedandin û li ser pirsa min jî got, ew ji xelkê Çilaxa ye:

- Tu weke Kurdê Çilaxa, tu wê li dijî çeteyên DAIŞ'ê û Şamê kerameta xelkê xwe biparêzî?

- Ez ê weke Erebê Çilaxa kerameta xelkê xwe yê deverê biparêzim.

Yekîtiya Kurdan û seferberiya wan xisleta sereke ya vî şerê man ê nemanê ye. Lê Ereb û Suryaniyên Rojavayê Kurdistanê jî xwe ji miletên Kurdistanê dibînin û xwe tevayî vê seferberiya Kurdistanê kirine ji bo parastina xak û kerameta miletê Kurd.

Ha niha bi vê birînê ez ê biçim bereyê

Li Çilaxa şervanan çayeke tarî danî ber me. Min jî, Brahîmê şifêr jî, me rahişt çaya xwe vexwar. Sobeyeke mazotê ew odeya tarî û teng di wê roja şiliyê de germ dikir. Berê awirê min çû ser birîna lingê şervanekî:

- Navê te bi xêr?

- *** Ereb.

- Tu kengî birîndar bûyî?

- Pêr li gundê Sefa, li ser xeta bereya şer.

- Çi qewimî? Gule li lingê te ket?

- Nexêr, êrişa bi dronê bû. Du hevalên ji Ronahî TV li bereya şer bûn. Gava dijminan bi çend dronan êriş kir, me sisê dan erdê lê yek jê filitî û berê xwe da wesaîta hevalên rojnamevan ên Ronahî TV'yê. Ji bo ku wan hişyar bikim û her wiha dronê bînim xwar, min lê reşand. Guleyek li dronê ket, ji ber wê dron beriya bigihîje hedefa xwe, kete xwarê. Lê bi teqînê re çend parçe li min ketin. Birîna giran lingê min e. Birînek li ser paqa min heye û birîneke din jî heye, parçe li pişta min ket.

- Xwedê bi silametî bike. Tu ji Erebên Çilaxa yî?

- Mala te ava. Nexêr, ez ji Riyadê me.

- Riyad, yanî paytexta Siûdî?

- Erê wele.

- Tu wê niha çi bikî?

- Heger heval niha bihêlin, ez ê biçim bereya şer. Nehêlin jî piştî sê çar rojên din, ez ê karibim li ser xwe bimeşim, ez ê bi xwe biçim.

Ev şervanê ciwan, ji paytexta Erebistan Siûdî, piştî dagirkeriya dewleta Tirk a li dijî Efrînê, hatiye û xwestiye bibe parçeyek ji Şoreşa Rojava. Niha di nava seferberiya Kurdan a ji bo parastina Rojava de li bereya herî pêş şer dike. Ev îrade Kurdan dike yek deng, dostên wan eşkeretir dike û dijberên wan jî neçar dike ku bi wan re li ser maseyê rûnin.

*** Ji ber ku nexwest ez navê wî binivîsim, ez li vir navê wî naninivîsim.

Gotara nefretê li dijî Kurdên Sûriyê di medyaya dijîtal de

Mînaka hesabê 'AL-Raqqa tuzbeh bîsemit'

Fetah ÎSA*

Meydana dijîtal, bi amûrên xwe yên berfireh ên danûstandinê yên mîna platformên medyaya dijîtal, neynikek e ku aloziyên civakî û siyasî nîşan dide. Lê belê, ew di heman demê de jîngeheke berdar e ji bo belavbûna awayên nû yên dûrxistina ji hev a komên civakî û dijminahiya di navbera wan de jî.

Yek ji dijwarîyên sereke yên ku civakên cihêreng bi wan re rû bi rû ne, diyardeya gotara nefretê ye ku bi taybetî komên hindikahî yan yên ku mexdûrên marjînalîzekirina dîrokî ne, dike armanc. Kurd yek ji wan neteweyên hindikahî ne li Sûriyê yên ku li hawîrdora dijîtal herî zêde rastî gotara stereotîpkirina nerênî û provokasyonan tên. Ev yek heta bi avakirina gotareke nefretê ya eşkere diçe ya ku bandorek nerênî li ser nasname û ewlehiya wan a civakî û derûnî dike. Tevî zêdebûna eleqeya cîhanî li ser diyardeya gotara nefretê, lêkolînên taybetî yên ku amûrên analîtîk ên kûr bi kar tînin ji bo lêkolîna gotarê nefretê ya nexasim li dijî Kurdan a di medyaya dijîtal de hîna sînordar in.

Çarçoveya teorîk û metodolojîk a lêkolînê

Em li vir, li gotara nefretê ya li dijî Kurdan a di naveroka hesabê 'Al-Raqqa tuzbeh bîsemit a li ser malpera Facebookê dinihêrin. Girîngiya lêkolînê ji hewcedariya şopandin û belgekirina vê gotarê bi awayekî metodolojîk tê. Bi vê, em dikarin wêneyekî rewşê yê zelal bidin aliyên peywendîdar da ku tedbîrên pêwîst bigirin.

Em ê ji xwe bipirsin, ka çi şêwaz û peyv di gotara nefretê ya li dijî Kurdan de di vî hesabî de tên bikaranîn. Kîjan kategoriyên sereke yên gotara nefretê tê de hene: provokasyona rasterast, stereotîpkirina nerênî, tinazê xwe pêkirin, û wekî din. Gava me ev kir em ê berê xwe bidinê ka gelo ev gotara nefretê ya li dijî Kurdan xwe bi giranî disipêre gotinan (devkî û nivîskî) yan dîmenan (wêne û vîdyo). Li vir di heman demê de wê muhim be ku berê xwe bidin mîqdar û pirrcarkirina wan peyv û hevokên ku nîşana nefreta li dijî Kurdan in jî.

Sê hîpotezên min hene, ya yekê ew e ku ev gotara nefretê bi giranî li ser mijarên siyasî û neteweyî yên weke mijarên nasnameyê disekine, ne li ser mijarên civakî an aborî, ya diduyan jî ew e ku stereotîpkirina nerênî şêwaza herî berbelav e di vê gotara nefretê, jixwe li pey wê jî provokasyona rasterast a tundûtûjiyê tê. Hîpoteza min a dawiyê jî ew e ku têkiliyeke statîstîkî ya giring di navbera xwezaya naverokê û tundiya gotara nefretê de heye.

Têgeh û agahiyên giring

Gotara Nefretê li vir ew gotar e ku êriş dike, teşwîqî cudakariyê dike, yan jî navûdengê kesekê/î yan komekê li ser bingehê nasnameya wê/wî ya neteweyî, qewmî, olî û wekî din reş dike. Di vê çarçoveyê de ji bo vê lêkolînê gotara nefretê li dijî Kurdan jî her naverok e -çi nivîs, wêne, vîdyo, çi jî şirove- ku li ser hesabê faxcebookê yê 'Al-Raqqa tuzbeh bîsemit' de hatiye weşandin ya ku tê de heqaret, provokasyon, yan jî stereotîpkirina nerênî li ser bingehê aîdiyeta qewmî/neteweyî ya Kurdan heye, û armanca wê ew e ku dijminahiyê çêke yan jî Kurdan piçûk bixe.

Peyva gotara nefretê car pêşî di medyayê de li

■ Sorkerên sereke yên gotara nefretê aliyên siyasî û leşkerî yên têkildarî arîşeya heyî ne, û ne cûdahiyên çandî yan civakî. Ev yek, gotara nefretê vediguherîne amûreke ji bo şer û pevçûnê, lê ne îfadekirina cudahiyeke civakî.

Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) di sala 1989'an de derket. Tê de pirsgirêkên têkildarî gotara nijadperest a ku bi qanûna parastina azadiya derbirînê hatibû parastin, hebû.

Kurd bi xwe, ew hindikahiya qewmî ya herî mezin in li Sûriyê û qederê ji sedî dehê nifûsa wê pêk tînin. Piraniya wan Misilmanên Sunnî ne, hin ji wan Êzîdî ne, wekî din hejmareke pirr kêm a Mesîhî û Elewiyên Kurd jî heye. Piraniya Kurdan li Sûriyê li parêzgeha Hesekê li bakurê rojhilatê Sûriyê, li Qamişlo û Amûdê, û li du bajarokan, li parêzgeha Helebê li bakurê Sûriyê li Kobanî û Efrînê û derdora wan dimînin. Kurd li van deveran pirraniya xelkê pêk tînin.

Kurdan li Sûriyê bi sedsalan e ku hene, û wan di serdemên dîrokî yên cuda de beşek ji avahiya demografîk pêk anîne. Zilm li Kurdên li Sûriyê, bi taybetî di bin serweriya Partiya Beesê de hat kirin, nexasim jî têkildarî mafên wan ên sivîl û çandî. Di dema Şoreşa Sûriyê (2011-2025) de hêzên siyasî û eskerî yên Kurdan yên herî navdar bûn Yekîneyên Parastina Gel (YPG) û Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD), wan deverên berfireh li bakur û rojhilatê Sûriyê kontrol kirin. Wan damezrandina "Rêveberiya Xweser" (ya ku bi navê "Rojava" tê nasîn) ragihandin, da ku saziyeke îdarî ya ku xwedî xweseriyeke rastîn e, pêk bînin.

Herçî têgeha stereotîpkirinê ye, gava li vir ez dibêjim, stereotîpkirin, ez behsa girêdana Kurdan bi taybetmendiyên giştîkirî yên nerênî yên diyarkirî dikim: çavbirçîtî, xayîntî, sîxurî.

Ez provokasyonê jî weke banga eşkere yan neyekser a bi rêya weşanên hesabê facebookê ji bo dûrxistin, êrişkirin, yan girtina tedbîrên cezakirinê -çi siyasî, civakî, çi jî fizîkî- li dijî ferd yan jî komên Kurd pênase dikim.

Nimûneya lêkolînê

Hesabê facebookê yê bi navê 'AL-Raqqa tuzbeh bîsemit' nimûneya lêkolînê ya diyarkirî ye, û hemî weşanên wê li xelkê vekirî ne. Me Qerta Analîzkirina Naverokê weke amûra sereke bi kar anî ku bi rêya tabloyeke birêkûpêk daneyan ji her weşanê bi awayekî metodolojîk tomar dike û wan vediguherîne daneyên ku dikarin bên analîzkirin. Me tenê berê xwe da vî hesabê 'Al-Raqqa tuzbeh bîsemit' ê li ser platforma facebookê. Me li tevahiya parvekirinên vî hesabî yên Çiriya Pêşîn a sala 2025'an nihêrî. Me her wiha berê xwe da şiroveyên li ser van parvekirinan hatine kirin jî.

Teoriya çarçovekirinê û analîza naverokê

Teoriya çarçovekirinê yan jî teoriya çarçovekêşiyê ji bo şirovekirina ka wêneyê Kurdan di peyamên nefretê de çawa tê avakirin û çêkirin me bi kar anî, ji bo wan parvekirinên ku ew bi taybetmendiyên xas ên fena "xeterî", "sîxurî", "cudaxwazî" têne çarçovekirin da ku têgînên nerênî zêde bikin û dijminahiyê li hember wan rewa bikin.

Weke rêbaz jî me naveroka van parvekirinan analîz kir. Ji bo lêkolîna nimûneyên nivîs, wêne û dîmen wesfî guncaw e. Ew destûrê dide ku em karibin daneyên çendanî (peyvek çend caran hat bikaranîn?) bi dest bixin lê her wiha em dikarin di heman demê de daneyên çawanî (maneya peyvê û motîvasyonên li piştê çi ne?) jî bi dest bixin.

Encamên pratîkî yên lêkolînê

Bi awayekî eşkere xuya dike ku zêdetirî ji sedî şêstê parvekirinên hesabê 'Al-Raqqa tuzbeh bîsemit' gotara nefretê li dijî Kurdan dihewînin. Nêzîkî ji sedî notê parvekirinên wê yên ku gotara nefretê dihewînin, nivîs in. Ji sedî dehê mayî ji materyalên dîtbarî yanî parvekirina wêne û vîdyoyan pêk tê. Di nava van parvekirinên devkî û dîtbarî de cûreyên cuda yên gotara nefretê li dijî Kurdan tên bikaranîn û di nava van de provokasyon, stereotîpkirin, tinazêxwepêkirin, weke xayîn binavkirin hene.

Peyvên sereke yên ku ji bo vê gotara nefretê herî zêde dubare tên bikaranîn jî ev in: Milîsên QSD, pûcî (Apocî), terorîst, zordest, em tên, Reqqaya dagîrkirî, tirsandin, hêzên leşkerî yên zêde.

Gava em berê xwe didinê ka ev parvekirinên ku gotara nefretê dihewînin, bandoreke çiqasî zêde dikin di warê asta hevkarîgeriyê de, em dibînin ku rêjeya navînî ya ecibandinan (like) di van parvekirinên gotara nefretê de nêzîkî sê hezar ecibandinan e. Rêjeya navînî ya şiroveyan jî nêzîkî 250 şiroveyan e. Rêjeya navînî ya parvekirinan (share) jî digihîje nêzîkî 25 parvekirinan.

Encama lêkolînê

Hebûna gotara nefretê di hesabê 'Al-Raqqa tuzbeh bîsemit' de zelal e û ev gotara nefretê bi awayekî sîstematîk Kurdên Sûriyê dike armanc di nav nîqaş û danûstandinan de. Di diyardeyên gotara nefretê de cihêrengî hebû, yanî ew ne tenê bi heqaretên eşkere sînordar bûn. Li şûna wê, bikaranîna peyvên stereotîpkirinê yên ku Kurdan wek aliyekî xayîn yan cudaxwaz nîşan didin gelek in. Encaman destnîşan kir ku sorkerên sereke yên gotara nefretê bi gelemperî alî û paşxaneyên siyasî û leşkerî yên têkildarî arîşeya heyî bûn, û ne cûdahiyên çandî yan civakî. Ev yek, gotara nefretê vediguherîne amûreke ji bo şer û pevçûnê, lê ne îfadekirina cudahiyeke civakî.

Lêkolînê nîşan da ku platformên medyaya dijîtal, tevî giringiya xwe di gihandina dengê qurbaniyên şer de, dikarin veguherin jîngeheke welê ya ku rê xweş bike li ber belavbûna gotarên nefretê û provokasyonê li dijî hindikahî û pêkhateyên cuda, nexasim di çarçoveya qeyran û şeran de.

Nebûna hişyariya dijîtal xetera gotara nefretê û bandora wê zêde dike. Bi ser de jî qanûnên neteweyî yên ku gotara nefretê û provokasyona mezhebî yan qewmî li ser înternetê weke sûc bibîne tine ne.

Bi her halî vê nimûneyê nîlan da ku pêdivî bi lêkolînên kûr ên ku çavkanî û qada belavbûna vê gotarê dişopînin û analîz dikin heye da ku bandora wê li ser proseya biryardanê yan jî meylên raya giştî li derveyî medyaya dijîtal jî bipivîn.

* Xwendekara bernameya masterê ya Sosyolojiya Perwerdehiyê ya Zanîngeha Kobanê

Mamoste çawa motîvasyona beşdarbûnê zêde bikin

Ezmûneke li Zanîngeha Kobanê

Rola mamoste di afirandina derfetan, misogerkirina û dabînkirina piştgiriyê, û çalakkirina xwendekaran de di warê avakirina motîvasyonê û xurtkirina bawerîbixweanîna xwendekeran de pirr giring e. Sê gavên derfetçêkirin, teşwîqkirin û misogerkirina pratîkê jî vediguherin çêkirina meydaneke ji bo pratîka azadiyê.

Firyaz BERKEL*

Çalakiyên zanîngehê ji bo avakirina baweriyê û bipêşxistina jêhatîbûnên xwendekaran xwedî cihekî giring in. ez dixwazim bi tecrûbeyeke xwe ya li Zanîngeha Kobanê behsa vê mijarê bikim. Di dema amadekirina çalakiya 25'ê Mijdarê Roja Têkoşîna li diji Şideta bermaberî Jinan a Cîhanê, heft xwendekarên jin yên beşa wêje û zimanê Kurdî daxwaz kirin ku beşdarî çalakiyê bibin û semînerekê bidin. Weke Seroka Beşê Jineolojyê û koordinatora çalakiyê, min ev daxwaz erê kir da ku derfetê bidim xwendekaran dengê xwe bidin bihîstin û motîvasyona xwe ji bo beşdarbûna siberojê zêde bikin.

Beriya niha hin lêkolîn bi meseleyê daketine, yek ji wan a Bell Hooks e, ew dibêje, gava mirov cih dide xwendekaran da ku xwe îfade bikin, ev ji bo xwendekaran dibe kirineke azadker û serdestiya kevneşopî a di nav polê de sînordar dike, pê re jî dike ku baweriya xwendekaran bi wan zêde bibe (1994, r. 27). Ez yeqîn dikim ku bi vê tecrûbeya ez behsa wê dikim jî di sê gavan de min karî vê pratîka azadiyê tesbît bikim. Paulo Freire jî bawer dike ku beşdarbûna di çalakiyan de dibe alikar ku xwendekar hişmendiya xwe bi pêş bixin. (1970, r. 45).

Derfetê bide û piştgir be

Min hewl da hestên xwendekaran analîz bikim, di wan bigihîjim û guhertinên di motîvasyona wan de heger derkevin holê, şirove bikim. Ji bo vê min çavdêriya van her heft xwendekaran kir û paşê jî ez bi wan re peyivîm. Ev peyivîna min a bi wan re mirov dikare weke hevpeyvîneke ne fermî ya serbest binirxîne. Di destpêka pêşkêşkirina gotara wan a semînerê de tirs û fikarên xwendekaran diyar bûn, lê performansa wan bi teşwîqkirin û bersivên ku motîvasyona wan zêde bikin yên ji temaşevanan, hêdî hêdî baştir bû. Di hevpeyîvînan de yên bi heft xwendekaran re jî piştrast bû ku derfeta beşdarbûnê, sedema sereke ya amadebûna wan a ji bo vê yekê bûye.

Sê gav weke pratîkeke azadiyê

Daneyên bi dest min ketin, nîşan didin ku motîvasyona xwendekaran di sê qonaxan de bi pêş ketiye:

1) Çêkirin derfetê: Ev keliyeke giring bû ku xwendekaran dudilî û hesta berpirsiyariya xwe ya destpêkê li pey xwe dihişt û jê dibihurîn.

2) Piştgiriya rasterast a zanîngehê (saziya perwerdehiyê): Teşwîqkirina domdar di dema pêşkêşkirinan de fikar kêm kirin û baweriya xwendekaran a bi wan zêde kir.

3) Ezmûna pratîkî: Piştî bûyerê, baweriya xwendekaran bi wan zêde bû û xwesteka beşdarbûnê çalakiyên li zanîngehê ji bo sberojê jî eşkere bû.

Em dibînin ku ev her sê gav bi maneya pratîka azadiyê ya Hooks de dikarin werin şirovekirin û teşwîqkirin. Ev hersê gavên weke derfetçêkirin, teşwîqkirin û misogerkirina pratîkê jî vediguherin avakirina meydaneke ji bo vê pratîka azadiyê. Bi giştî vê ezmûnê nîşan da ku rola mamoste di afirandina derfetan, misogerkirina û dabînkirina piştgiriyê, û çalakkirina xwendekaran de di avakirina motîvasyonê û xurtkirina bawerîbixwanîna xwendekeran de pirr giring bûye. Tesîrkirina destpêkê veguherî ezmûneke serketî û vê yekê alikarî kir ku dengê xwendekaran zêde bibe û hebûna wan a akademîk xurt bibe.

Çavkanî

Freire, P. (1970). Pedagojîya bindestan (ji wergera Erebî ya bi wergera Fahd Hussein). Beyrût: Dar wa Maktabat al-Hilal.

Hooks, B. (1994). Teaching to transgress: Education as the practice of freedom. London û New York: Routledge.

* Xwendekara bernameya masterê ya Sosyolojiya Perwerdehiyê ya Zanîngeha Kobanê

Tundiya devkî li dibistanan û rola mamoste

Nadiya HISÊN*

Nebûna stratejiyên perwerdehiyê yên bi bandor, pirsgirêkê girantir dike; nebûna şopandinê û rêveberiya polê ya qels jî bandora xwe dike. Ji ber wê pêdivî bi bernameyên perwerdehiyê yên baş heye ku balê bikişînin ser bipêşxistina jêhatûbûnên ragihandinê, rêzgirtina ji yên din re û perwerdekirina mamosteyan ji bo miamelekirina bi reftarên êrişkar re.

Tundiya devkî li dibistanan, diyardeyeke pirr gişti ye û bandoreke mezin li ser jîngeha perwerdehiyê dike. Ew bikaranîna zimanekî ne guncaw û zirardar e. Ew zirarê dide psîkolojiya kesên din. Ew bi şiklê heqaret, tinazêxwepêkirin, piçûkxistina yên din tê. Mamoste di rêberiya reftarên xwendekaran û şekildana çandeke polê ya li ser bingehê rêzgirtinê de bi roleke giring radibe. Armanca vê kurtelêkolînê ew e ku sedem û rêbazên pêşîgirtina li belavbûna diyardeya tundûtûjiya devkî li dibistanan rave bike û rola mamosteyan di rawastandina vê diyardeyê şirove bike.

Em ê hewl bidin nas bikin ka têgeha tundiya devkî çi ye, Şiklên wê, sedem û bandora wê ya derûnî li ser xwendekaran û rola mamosteyan di rawestandina wê de çi ye. Em ê nexasim bi têgeha bullying (belaxwetêdan) dakevin Barbara Coloroso (2008), bi "The Bully,The Bullied, and the Bystander" li ser stratejiyên pratîkî yên mamosteyan ji bo rawestandina diyardeya tundiya devkî li dibistanan disekine. Dan Olweus (1993) jî bi "Bullying at School : What We Know and What We Can Do" li ser rola mamosteyan di avakirina jîngeheke perwerdehî ya ewle û baş disekine.

Şideta devkî bêhtir bandorê dike

Em têgeha tundiya devkî li dibistanan weke bikaranîna peyvên ne guncaw û jandar ji bo zirara derûnî bigihîne kesên din bi gişti pênase dikin. Rigby (2010) wê wekî bikaranîna peyv yan hevokan bi awayekî ku armanc dike zirara hestyarî yan civakî bide kesekî din, pênase dike. Ew her wiha rave dike ku tundiya devkî ji ya laşî girantir e û bandora wê ya derûnî demdirêjtir e.

Li gorî Bandura (1977) cezakirin ji bo pêşîgirtina tundiya devkî bi kêr nayê. Ew îşaret pê dike ku zarok reftarên xwe yên şidetê, tundûtêjiyê bi rêya teqlîdkirin û weke modelgirtina reftarên derdora xwe hîn dibin. Li gorî vê jî mamoste di polê de mînakeke erênî be ji bo xwendekaran, xwendekar dê wî teqlîd bikin û reftarên wan dê ji tundiya devkî dûr bin û ji hev re rêzdar bin.

Ew tekez dike ku kontrolkirina reftaran di nav polê de divê li ser bingehê rêzgirtina ji hev re ya dualî, hevkariyê û întegrasyona komê be, ne li ser rêbazên desthilatê be. Ji vê perspektîfê, mamoste mîna rêberekî perwerdehiyê ye ku jîngeheke polê ya hevkar û ewle diafirîne û tê de diyalog û rêzgirtinê teşwîq dike (Nelsen, 2006).

Ev teorî ji bo lêkolînê kêrhatî ne ji ber ku em dikarin bi çavdêrîkirin û modelkirina tevgera mamosteyan, reftara xwendekaran hem erênî û hem jî nerênî fêm bikin da ku pêşî li vê diyardeyê bigirin û têkiliyên bi sihet ava bikin.

Em ji çi re şideta devkî dibêjin

Gava hinek tinazê xwe bi hinan bikin, heqaret bikin, gefan bixwin, kesayeta hinan piçûk bixin, ev bi gişti dibe şideta devkî. Espelage & Swearer (2010) dibêjin, tundiya devkî dikare paşê bibe tundiyeke laşî, nemaze di nebûna çavdêriya malbatê û perwerdehiyê de.

Gelek sedemên vê tundûtûjiyê hene. Di nava sedemên ferdî de ew yek heye ku zarokên xwedî kesayetiyên zeîf, ji bo xwe îsbat bikin û zeîfbûna xwe veşêrin, meyla wan heye ku peyvên êrişkar bi kar bînin (Smith, 2016). Ji bo sedemên malbatî, Bandura (1977) dibêje, "Zarok bi temaşekirin û teqlîdkirina modelên li dora xwe, hînî reftara êrişkar dibe."(r. 22). Ji bo sedemên ji ber dibistanê, Esplelage & Swearer (2010) dibêjin, tinenebûna qanûnên zelal ji bo kontrolkirina tevgerên xwendekaran li dibistanan, belavbûna vê diyardeyê teşwîq dike. Mirov dikare bikaranîna şidetê ya belav di nava medyayên dijîtal de jî weke sedem li van zêde bike, ji ber ku tinazêxwepêkirin û heqaretlikesankirin di van medyayan de veguheriye weke beşeke normal a danûstandinê.

Lêkolîn nîşan dide ku xwendekarên ku rastî tundiya devkî tên pir ditirsin, ji têkiliyên civakî vekişiyane, naxwazin fêr bibin, baweriya wan bi wan tine ye, û beşdariya xwe di çalakiyên polê de jî kêm dikin.

Mamoste dikare çi bike?

Mamosteyên dibistanê dikarin bi modelkirina erênî, ji bo xwendekarên xwe bibin modeleke erênî. Mamoste bi diyarkirina qaîdeyên zelal ên di nava sinifa xwe de dikarin pêşî li helwêst û reftarên êrişkar bigirin. Gava mamoste hişyar bin, bi destwerdana zû pêşî li dewamîbûn û giranbûna şideta devkî û bullyingê bigirin, ji ber ku derengketin dihêle ku pirsgirêk mezin bibe û paşê neyê kontrolkirin. Li aliyê din mamoste her wiha bi çalakiyên hinkeriyê yên ku zîrekiya hestyarî ya xwendekaran zêde bike, hêrsa wan kêm bike û gihiştina wan a di hestan xurt bike, xwendekarên xwe di vî warî de bi disîplîn bike (Rigby, 2013).

Di polan de şidet heye

Min bi metodolojiyeke şiroveker û rêbaza çavdêrî û analîza navarokê berê xwe da pratîka li Kobanê. Teoriya fêrbûna civakî ya Albert Bandura û teoriya disîplîna erênî ya Jane Nelsen (2006) jî bi kêra min hatin.

Çavdêriyên di polan de diyar dike ku diyardeya şideta devkî tim dubare dibe û bandoreke derûnî a nerênî çêdike. Min çavdêriyên xwe li polên sala nihan a li dibistanên Kobanê sala 2025'an kirin. Min hewl da ku mijara tundî, şikl, sedem û bandora derûnî û reftara mamoste wek nimûnekirin û rola wê/wî bibînim.

Daneyan li gorî çavdêriyê nîşan da ku tinazêxwepêkirin, heqaret, peyvên nerênî û bilindkirina dengê xwe, reftarên êrişkar di nav xwendekaran de belav in. Ev tundûtûjî pirr caran ji teqlîdkirina reftarên yên din, reaksiyonên mamoste, yan jî ji zextên derûnî û civakî derdikeve hole.

Destwerdana perwerdehiyê ya erênî dibe alîkar ku xwendekaran ber bi reftarên erênî ve biçin, diyalogê bi pêş ve bibin û pirsgirêkên di nava polê de çareser bikin. Reftarên mamoste wekî nimûneyeke erênî ya ji bo xwendekaran tundiyê kêm dikin, lê nebûna çavdêriyê yan bersivên nerênî dikarin şidetê girantir bikin. Yanî pêwîst e ku têkiliyeke erênî di navbera xwendekar û mamoste de hebe.

Li şûna encamê

Çavdêrî û analîzê eşkere kir ku tundiya devkî ya di nav xwendekaran de pirr caran ji hêla kesên li dora wan ve tê teqlîdkirin. Xwendekar dema ku nikarin hestên xwe derbibirin, heqaretê dikin yan jî didin qîran. Dibistan hîn jî ji bo bipêşxistina jêhatîbûnên ragihandinê yên xwendekaran hewceyê bernameyan in.

Hin mamoste pirr dereng mudaxele dikin, ev yek jî nîşan dide ku tedbîrên pêşîlêgirtinê nînin, û hin mamoste zimanekî tund bikar tînin, ku mînakeke nerênî nîşan didin. Tundiya devkî li dibistanan belav e, ev yek nîşan dide ku nebûna hawîrdoreke dibistanê ya piştgir tevgerên êrişkar pêş dixe.

Ji ber wê di encamê de em dikarin bibêjin, tundiya devkî di dibistanan de diyardeyeke gişti ye, ew bi destketî ye û ne xwemalî ye. Faktorên civakî û zextên derûnî van reftaran zêde dikin. Nebûna stratejeyên perwerdehiyê yên bi bandor, pirsgirêkê girantir dike; nebûna şopandinê û rêveberiya polê ya qels jî bandora xwe dike. Ji ber wê pêdivî bi bernameyên perwerdehiyê yên baş heye ku balê bikişînin ser bipêşxistina jêhatûbûnên ragihandinê, rêzgirtina ji yên din re û perwerdekirina mamosteyan ji bo miamelekirina bi reftarên êrişkar re.

Çavkanî

Bandura, A. (1977). Social learning theory. Englewood Cliffs, NJ: Prentice-Hall.

Coloroso, B. (2008). The bully, the bullied, and the bystander: From preschool to high school — How parents and teachers can help break the cycle of violence (Updated Collins Living ed.). Collins Living.

Espelage, D. L., & Swearer, S. M. (2010). Bullying in North American schools: A social-ecological perspective on prevention and intervention (2nd ed.). New York, NY: Routledge.

Nelsen, J. (2006). Positive discipline. New York, NY: Ballantine Books.

Olweus, D. (1993). Bullying at school: What we know and what we can do. Malden, MA: Blackwell Publishing.

Rigby, K. (2013). Bullying in schools: Addressing desires, not only behaviours. Cambridge: Cambridge University Press.

Smith, P. K. (2016). Understanding school bullying: Its nature and prevention strategies. Routledge.

* Xwendekara bernameya masterê ya Sosyolojiya Perwerdehiyê ya Zanîngeha Kobanê

Sînorê di navbera Kurd û Ereban de

Ehmedê Şeng mezinê Dodikiyan û şerê li dijî Gêsan

■ Di destana Ehmedê Şeng de çiya ew mekan in ku Kurdan lê şax berdane û lê xweser in, çol jî weke mekan erd û eqarên eşîrên Ereb in. Ji ber wê, em dikarin bibêjin, Çiyayê Evdilezîzê sînorekî sîmbolîk û pratîk e

Bihar e, xweş bihar e,
Eskeran bikin kar e,
*Ehmedê Şeng mala xwe bar kir, deyna li bin Çiyayê Evdilezîzê, li pêş miqabilî neyaran... **

Siwarê Kurd ji kitêba 'Illustrated Travels' ya H.W. Bates a sala 1875'an li Londonê hatî weşandin.

Ev destpêka destanekê, hema welê jixweber nîne. Em behsa destanekê dikin ku li gorî destanên din kêm tê nasîn: Destana Ehmedê Şeng. Ehmedê Şeng mezinê eşîra Dodikiyan, "li bin Çiyayê Evdilezîzê, li pêş miqabilî neyaran" mala xwe datîne. Em li vir esas li eqarên dîskurseke li ser sînoran in, eynî weke di destana Dewrêşê/Derwêşê Evdî de. Ji ber wê, êdî veguherîbe adetekê jî wê ne şaş be mirov behsa xwe bibe ser meseleya sînor û nasnameyê ya li cem Barth. Barth (1969: 9-37) û fikra komên etnîk û meseleya sînor, wê gelekî alîkar be bi me re ku em analîzeke pak û bikêrhatî bikin li ser destana Ehmedê Şeng. Em dikarin her wiha ji fikra Barth a li ser tesewerura sînorên komê (2000: 22-23) jî sûdê wergirin.

Em ji maneya peyvê dest pê bikin; sînor eqarên li ser zemîn ji hev cihê dikin, ew xetên ku komên civakî ji hev cuda dikin, datînin, û ew mestereyekê datîne ber me ji bo wê tişta ku kategoriyên hizrî ji hev cihê dike (Barth 2000: 17). Lê belê di hizra Barth de ev sînor û maneya wê ji bo gelek civakan ne lê ye. Jixwe ji bo civakên koçer (nimûneya wî ya li ser Basseriyên Îranê) bi ya wî nîzam xwe nasipêre sînoran (2000: 19). Ew van nimûneyan dide ji bo nîşan bide ku ev taybetmendî û pirrengî winda dibin, gava mirov têgeheke sînor a yekreng pêşniyaz bike. Ew dixwaze pirrenigiya çandî li ber çavan were girtin: Çi dike ku mirov sînor deynin, bikişînin? Ev pirs bi ya wî diyarker e. Lê erê kengî sînor tên danîn?

Bersiva ewilî wê bibe sînor tiştên ji hev cuda, cihê dikin. Yanî hizreke ku gava em berê xwe bidinê weke keviyên tasekê be. Nimûneyên wê herî zêde em di pratîka dewletan de dibînin, lê ew jî gelo çi qasî zelal û diyar in, hê jî ne darîçav e. Barth bi alîkariya helbesteke şairê Lehistanî, Wisława Szymborska jî îşaret pê dike ku sînor ji mirovan nasname û pasaportan dipirse lê ma ji tişta ne mirov:

Ho sînorên qulo-pilo yên wan dewletên bi destê mirovan çêkirî!
Çendîn ewrên li ezmanan bêceza ji we bihurîn,
Çi qas ji wê qûma çolê ji welatekî ber bi welatê din ve diherike;
Çendîn ji wan zixurên çiyayan digindirin ser erdên welatê xerîb
bi wan hilpekînên provokatîf!
…
Bi tenê ya ku insan e dikare xerîb be.
Ya mayî dirext û giyayên tevlîhev, xiltên rûxîner û ba ye.**

Li vir, bi nimûneya vê helbestê Barth esas balê dibe ser wê yekê ku sînor tiştekî bi temamî elaqedarî mirovan e û weke têgeh tê avakirin. Em bi xêra vê, dikarin li fikra wî ya 1969'an jî vegerin. Beriya Barth, qewm (komên etnîk) weke komên nisbî biîstîqrar ên ku xwedî hin xisletên -ziman, çand, dîn, rêûresm- hevpar dihatin dîtin, lê wî ev paradîgma guherand. Li gorî wî, qewm ne ji ber xisletên çandî yên hevpar hene lê ji ber sînorên di navbera 'me' û 'wan' de qewm hene. Lê belê, li vir sînor ne sînorên fizîkî yan jî cewherên çandî ne, ew cihêrengiyên ku civakî hatine afirandin bi xwe ne. Yanî ew cudatî yan jî cihêrengî, bi destê civakên insanan tên çêkirin.

Di encamê de jî ew dibêje, xisletên civakî dikarin biguherin, lê ev wî qewmî ji hev naxe. Tişta muhim li vir ew e ka kî weke endamê komê tê qebûlkirin hem ji aliyê endamên din ên komê ve û hem jî ji aliyê wanên li derveyî komê ve. Maneya vê jî ew e ku sînor ne bi tecrîd û jihevqutkirinê li ser xwe dimînin, lê bi danûstandinê. Gava em vê wiha bibînin, em dikarin bibêjin, nakokiyên elaqedarî meseleyê jî hene ku Barth bal biriye ser wan. Têkiliya di navbera yên derve û yên hundir de qewmîtiyê (nasnameya etnîk) ji holê ranake, berevajî wê, wê xurt dike. Nakokiya din jî ew e ku qewmîtî herî zêde li sînoran xuya ye, ne li navokê (1969: 14-15).

Li vir em dikarin berê xwe bidin wan çerxên ku sînoran li ser xwe digirin. Li gorî Barth, di nava van de qaîdeyên ji bo endametiya koma etnîk, guhertina nasnameyê ya li gorî rewşê, sinifandina bi çavên yên din û helwêsta stratejîk -xelk qewmîtiyê li gorî peywendê derdixe pêş yan jî nemuhim dike- hene (ibid.: 15-16). Ji ber wê jî di biwara avakirina qewmîtiyê de ev yek dihêle ku em ji bo qewm bibêjin, ew bi peywendiyan çêdibe, ne statîk e lê bi pêvajoyê çêdibe, ne tenê çandî ye ew her wiha siyasî û aborî ye jî; her çî sînor e, ew jî mekanê vê danûstandin û pêvajoyên çandî, siyasî û aborî ye.

Di gotara xwe ya sala 2000'î de Barth esas rexneyekê digire li wan modelên ku ji bo têgeha sînor maneya jihevqutkirinê derdixin pêş. Ew bi vê rexneyê, sînoran weke mekanên têkiliyan derdixe pêş: bazirganî tê kirin, fikr di nava koman de diçin û tên, nasname tên wergerandin û desthilat tê mizakerekirin. Ev jî dibe bingehekî xurt ê teorîk ji bo hizrên wî yên sala 1969'an.

Sînor li Kurdistana sedsala 18'an de

Ev têgehkirina sînor a li jor, ez ê li ber çavan bigirim ji bo analîza xwe ya li ser destana Ehmedê Şeng, wî mezin û maqûlê eşîra Kurd a Dodikiyan. Di destanê de mekanê sereke Çiyayê Evdilezîzê ye yan jî çawa hin caran ji ber darên kizwanan yên lê, jê re her wiha Çiyayê Kizwanan jî vê dawiyê hatiye gotin. Ev çiyayê hanê bi tevahiya maneyên xwe li gorî têgehkirina Barth, sînorek e di navbera eşîrên Kurdan û eşîrên Ereban de. Ji ber wê em xweşik tê digihin ka maneya "li pêş miqabilî neyaran" çi ye: sînorê bi wanên ne ji me re, lê ew sînor bi rastî jî ne sînorekî jihevqutkirinê ye. Em di naveroka destanê de bi rehetî pê dihisin çawa danûstandineke eşkere heye di navbera Dodikî û Gêsan de û bi maneyeke berferehtir de jî di navbera Kurd û Ereban de. Mekanê vî sînorî bi temamî li Rojavayê Kurdistanê yê îro li nava erdên Hesekê ye.

Bûyera di destanê de sala 1870'yî ji mêj bûye destanek û weke destan tê gotin jî. Wekî din ji ber ku îro pirr kêm variyantên wê hene, em dikarin bi hêsanî bibêjin ku ew ne ji wan destanên dengbêjiyê ye ku li ser bûyerên sedsalên 19 û 20'an hatine gotin. Di vê destanê de hîç behsa tivingan jî nayê kirin û sîlehên navê wan tên hildan serê pêşî rim in. Ji ber vê jî em dikarin qebûl bikin ku îhtîmal mezin e, bûyer beriya dawiya sedsala 18'an qewimîbe. Ev qewmîna hanê, ji bo dîroka Kurdan giring e ku mirov tê bigihîje ji ber sedemên cuda: Destan behsa hebûna Kurdan li Sûriyeya îro dike û behsa sînorên çandî, cografî dike yên di navbera eşîrên Kurd û Ereb de û ev sînor ne sînorên ji hev qutkirinê ne, lê belê sînorên têkilîdanîn û danûstendinê ne di gelek warên cuda yên weke, mêvanî, parastin, zêdegavî, talan, şer û tolhildanê de. Di vî warî de esas em behsa destanekê dikin ku muhtemel e, beriya destana Dewrêş/Derwêş û Edûlê şûna wê bigire, li Kurdistanê belav bû û naratîveke diyarkirina nasname, cografya û peywendiyên di navbera qewman de bû. Bi vê awirê em hewl bidin analîza xwe bi pêş bixin.

■ Di destanê de Dodikiyên Kurd xwedanê rewa û heq ên bikaranîna Çiyayê Evdilezîzê û zozanên wî ne. Gêsanên Ereb jî weke talanker ketine nava erdekî ku ew li serê mêvan yan neyar yan jî dijmin in. Yanî ev destan weke naratîv serweriya Dodikiyan li ser vî mekanê sînor rewa dike.

Kurd siwarê hespê tevî zirîpoşên xwe. Di koleksiyona wêneyên lîtografîk a Alexandre Orlowski ya sala 1819'an.

Sînor weke cografya

Ev destana hanê mekanê eşîra Kurdan a Dodikiyan pirrcarî diyar dike û navên sînorên wê weke mekanên li ser zemînê hildide. Ev mekanên li ser zemînê jî de-facto bi rola sînor bi maneya li cem Barth radibin. Ev mekanên li ser zemîn ên cografî, serê pêşî Çiyayê Evdilezîzê û zozanên wî ne. Li vir ya ku vî çiyayî û zozanan dike şûna sînoran bi maneya Barth behsa wan dike, bicihbûna Dodikiyan tevî pezê xwe ye. Helbet vegirtina konên Ehmedê Şeng jî weke sembola vê em dibihîsin. Em bi awayekî zelal û hevgirtî dibînin ku ev mekan weke mekanê eşîreke Kurdan, weke zozanên rewa yên vê eşîrê hatine pênasekirin û parastina wan jî li gorî adetê û anorê/rûmetê ye. Destan eşkere nîşan dide ku Dodikiyên Kurd xelkê çiyê ne û ew wî çiyayî fetih nakin, ew çiyayên wan e ku her bihar tênê.

Gava em berê xwe didin pênasekirina erdên Gêsan, ew jî pirr eşkere hatina pênasekirin: Ew ji binya Bexdayê ne, ji wan germiyan û çolistanan in ku li başûr û başûrrojhilatê Çiyayê Evdilezîzê ne.

Em li vir kontrasteke eşkere di naratîva vê destanê de dibînin. Çiya ew mekan in ku Kurdan lê şax berdane û lê xweser in, çol jî weke mekan erd û eqarên eşîrên Ereb in. Ji ber wê, em dikarin bibêjin, Çiyayê Evdilezîzê sînorekî sîmbolîk û pratîk e jî. Ew bi maneya xwe ya mekanê danûstandin, lihevrasthatin û têkiliyê jî sînor e, çawa ku di mêvandariya Dodikiyan a ji bo siwarên Gêsan de jî diyar e. Yanî, ev sînor heta ku dijminatî, dizî û talan nekeve nava meselê, mekanên lihevrasthatin û danûstandinê ne. Lê gava dijminatî, dizî û talan dikeve nava meselê jî vediguherin sînorên divê li halê xwe yê berê werin vegerandin: Talan bê vegerandin, mekanê pêrgîhevhatinê ji nû ve were avakirin, çimkî talanê ev sînor binpê kirine û heta bêkeramet kirine.

Sînor weke hiqûqeke di navbera eşîran de

Em li vir berê xwe bidin têgeha sînor weke hiqûqekî exlaqî di navbera eşîran de, nexasim di navbera eşîrên Kurd û Ereb de. Ev sînorê ku di destanê de li ser eşîra Kurd a Dodikiyan û ya Ereb a Gêsan li serê rasta hev tên, îro li rojhilatê bajarê Hesekê ye. Lê ev sînor cografî weke mekanekî diyar jî be, di destanê de em dibînin ku sînor esas weke xeteke heyatî ya exlaqî ye û ne sînorekî madî ye.

Sînor pêşî mêvandarî ye. Yanî ne jihevqutkirina eşîran (ên Kurd û Ereb) e, lê mekanê li gorî qaîdeyên eşîrî, adet û exlaqê civakî pêrgîhevhatin û têkiliyan e. Erê rast e ku mezinê Gêsan biryara rakirina terş û talanê Dodikiyan didin û wan çav berdaya Leylika Qemer yanî mehîna Ehmedê Şeng jî, lê ew li gorî adetan, bi mêvandariya Dodikiyên Kurd tên hewandin. Çaxê ku 150 siwarên Gêsan ên Ereb dikevine erd û eqarên Dodikiyan, ew li bin konê mezinê eşîrê Ehmedê Şêng dihêwirin. Tevî ku Ehmedê Şeng ne li mal e jî, Xatûnê, hevjîna wî xizmeta wan dike: Ew hespên wan ditewilîne, doşek û balgehan li binê kon ji bo wan datîne, taştê, firavîn û şîva wan çêdike, qehwê li wan digerîne. Yanî tam heft rojan mêvandariya li gorî adetên eşîrî li wan dike. Jixwe li gorî qaîdeyên adetên eşîrî yên Kurdan, mêvan parastî ne, ew mêvan dijmin jî be gava li binê kon xwe avêt bextê xwediyê kon, ew jî parastî ye.

Bi vê maneya xwe, hatina binê konê Ehmedê Şeng a 150 siwarên Gêsan, ne binpêkirina sînoran e. Ew hîna danûstandina li ser mekanê sînor pêk tîne.

Binpêkirina sînor

Gava ku piştî heft rojan, di mêvandariya xwe de hevjîna Ehmedê Şeng, Xatûn qisûrê nake, lê mêvanên wê yên Gêsî, beriya biçin li terş û talanê Ehmedê Şeng û Dodikiyan dixin, ha hingê ew wî sînorî binpê dikin. Yanî sînor ne xeteke madî ye ya ku hinek binpê dikin, lê mekanek e û binpêkirina wî jî esas şikandina adet, keramet, rûmet û anora eşîrî ya aliyekî ye. Siwarê Gêsan ên Ereb jî bi rakirina terş û talanê Ehmedê Şeng û Dodikiyan, vê yekê dikin. Ev kirina wan, yekser statuya wan a mêvanbûnê betal dike û wan dixe statuya 'dijmin'. Li vir dijmin di nava neynokan de ye, ji ber ku diyar e di bikaranîna li nava adetên eşîrî de neyar xwedî maneyeke dualî ye: Hem biyanî û hem jî dibe ku dijmin be. Lê dijmin êdî ew biyanî ye ku dijberiya wî îsbat bûye.

Tişta ku Gêsan beramberî Dodikiyên Kurd dike dijmin, xwedî du xisletên sereke ye. Yek jê, Gêsan bi rakirina terş û talanê Dodikiyan kerameta Dodikiyan şikandiye yanî sûcekî elaqedarî anora eşîrê li meydanê ye; ya din jî wan zerareke mezin a aborî daye Dodikiyan ku qebûla wê, wê karibe rê veke li ber encamên xirab ên elaqedarî guherîne mekanê sînor jî. Bi her halî di destanê de pirr eşkere ye, gava ku xiyanet bi mêvandarî Dodikiyan re tê kirin, sînor hatiye binpêkirin, ne ku gava 150 siwar tên bin konê mezinê Dodikiyan.

Mekanê sînor ji bo cudatiyên siyasî û rewakirina serweriya Dodikiyan

Gava em berê xwe didin meseleyên biryardayînê di nava her du eşîran de em cudatiyên sereke dibînin. Lê di zimanê destanê de hukim li van cudatiyan nayê birîn. Sermeselê çaxê ku Gêsan biryara rakirina terş û talanê Ehmedê Şeng didin û esas ew dixwazin Leylika Qemer yanî mehîna Ehmedê Şeng jî hilînin, eşkere ye ku Xalê Xewşabî Gêsan vê biryarê bi serê xwe dide bêyî şêwrê û dike ku 150 siwarên Gêsan bi vî karî rabin.

Biryara Ehmedê Şeng a vegerandina terş û talanê xwe ya destpêkê jî şexsî ye. Lê gava eşîr bi vegera bêyî siwarê xwe ya Leylika Qemer dihise, em dibînin ku pêvajoyeke şêwrê li dîwana Dodikiyan dest pê dike û di encamê de çar siwarên Dodikiyan li pey Ehmedê Şeng û hilanîna tola wî diçin. Ev cudahî ne tenê li ser pêvajoyên biryardayînê ne, em bi rehetî bi xisletên Gêsan ên weke talankeriyê û xiyanetê di şexsê kevnexulamê Ehmedê Şeng, Sergêsê Gêsî dihisin. Beramberî vê yekê, xisleta Dodikiyan jî ew e ku tevî ku bi siwar û şervanên xwe xurt in, biryara tinekirina yên hember nadin. Heta ji ber ku bi xiyaneta Sergêsê Gêsî nizanin, wî û malbata wî li nav konên xwe diparêzin jî.

Ev behsên li jor û cudahiyên hanê, elaqedarî têgeha sînor di peywenda qewmî û eşîrî de du tiştan nîşanî me didin. Ya yekê ew e ku Dodikî xwedanê rewa û heq ên bikaranîna wan erd û eqarên Çiyayê Evdilezîzê û zozanên wî ne û ya diduyan jî ew e ku Gêsan weke talanker ketine nava erdekî ku ew li serê mêvan, neyar yan jî dijmin in. Yanî ev destan weke naratîv serweriya Dodikiyan li ser vî mekanê sînor rewa dike.

■ Nîşana Leylika Qemer a herî mezin ew e ku ew sînor ji serketina xiyanetê re datîne. Leylika Qemer kujerê xayîn ê Ehmedê Şeng yanî Sergêsê Gêsî piştî ku benê xwe diqetîne, ji binê kon dikişîne û dikuje. Leylika Qemer weke dewameke zindî ya erdên Dodikiyan e, ew bîreke rewa û heq a xwedîtiya wî erdî nîşan dide.

Suwarên Kurd di dema şerê Rûs-Osmanî di salên 1877-1878 de.

Şêmûga li ber şidetê

Sînor di vê destanê de bi vegotineke epîk weke şêmûgekê jî hatiye sêwirandin, gava mirov ji wê şêmûgê dibihure êdî meydan dibe meydana şerî û ya şidetê. Ev metna epîk di wî warî de ka şidet kengî rewa ye, pirr zelal e. Pêşî behsa cihên eşîr lê ne û jê tên dike: Gêsan ji binya Bexdayê ji çolistanê tên, Dodikiyan hatine zozanên xwe yên li Çiyayê Evdilezîzê.

Piştre em dibînin ku behsa rêxistina Gêsan tê kirin ka mezinên wan çawa bê şêwr biryaran didin. Di warê Dodikiyan de jî Ehmedê Şeng weke mezinê eşîrê hatiye sêwirandin. Hatina Gêsan li bin konê Ehmedê Şeng, ne sedema şidetê ye, lê sedema nîşandana mêvandariyê ye. Dodikiyan, esas hevjîna Ehmedê Şeng 7 rojan mêvandariya wan bêqisûr dike. Diyar e ku di mohleta vê mêvandariyê de mêvan parastî ne. Lê dizî û talana piştî ku ji wir diçin, eşkere binpêkirina wî sînorî ye ku heta hingê rê li ber bikaranîna şidetê digirt. Ji ber wê jî gava Xatûn bi xemgînî û ji neçarî behsa meseleyê dike, Ehmedê Şeng dide dûv talankerên Gêsan û êdî em dibînin ku arîşe yan wê bi teslîmbûna Gêsan yan jî bi şer bi encam bibe. Gêsan ji talan biqerin jî hazir nînin bi xwe wî terş û talanî vegerînin. Ev yek dibe sedem ku Ehmedê Şeng yê ku bextê Leylika Qemer daye siwarên Gêsan, şerê wan bike. Em behsa şerekî dikin ku tê de Ehmedê Şeng bi taktîka şer a serketî, 150 siwaran bi hev ve dişidîne û her carê bi dehan ji wan dikuje, heta ku qederê sedî ji wan dikuje. Piştî hingê yên sax mayî doza bext dikin û Ehmedê Şeng jî wî bextî dide wan.

Heta bi vê deverê, tişta ku Ehmedê Şeng di warê sînor de dike, ew e ku sînorê heyî yê di navbera eşîran de ji nû ve ava bike. Ji ber ku ew rakirina terş û talanê eşîra xwe qebûl nake yanî erd û eqarên xwe diparêze, bi kirina xwe -vegerandina terş û talan bi destê talankeran- ew hem sînorên heyî ji nû ve ava dike û hem jî hiqûqa adetên eşîrî jî ferz dike.

Arafa xiyanetê

Piştî teslîmbûnê, di avakirina sînor de em arafekê dibînin. Sergêsê Gêsî ku ji kevnexulamên Dodikiyan e, xwe nêzî Ehmedê Şeng dike, dibêje, ew bi zorê xistine nava cerda talanê û ji xafil ve û bi xayînî rimekê li defa sînga Ehmedê Şeng dixe û wî dikuje. Ev yek di jinûveavakirina sînorê berê de dibe kêliyeke zelûliyê. Mirov nizane ka wê sînor vegere halê berê yan na. Yanî gelo hem terş û talanê Dodikiyan hat rakirin û hem mezinê wan hat kuştin û encama destanê ev e? Eeke kakunî û pirs ev dimînin. Lê em li vir sînorekî din dibînin, Leylika Qemer bi xwe weke sînorekî sîmbolîk nahêle ti siwarê Gêsan xwe nêzî wê û nêzî cenazeyê Ehmedê Şeng bike. Dilsoziya Leylika Qemer bi xeyal û sêwirandineke xurt hatiye vegotin ku di navbera talankeran û Ehmedê Şeng de bûye dîwarek, sedek, sînorek.

Gava Leylika Qemer bêyî siwarê xwe vedigere nava Dodikiyan, êdî mesele deng vedide, rûspî û peyayên Dodikiyan dîwana xwe datînin û biryarê didin ka kî wê li pey Gêsan biçe. Bi awayekî balkêş, em dibînin ku di bersivê de Dodikî li jin û zarokan tên rehmê û her wiha gava kevnexulamê xwe Sergêsê Gêsî nas dikin, wî û zarokên wî jî ji nava cerda xwe xilas dikin û li nava eşîra xwe bext didin wan. Em li vir sînorekî eşkere yê bikaranîna şidetê di nava Dodikiyan de dibînin. Yanî gava ku ew kerameta binpêkirî ji nû ve li wan vegeriya, şidet jî bi dawî dibe. Sînorê di vê vegotina epîk de sînorekî ji nû ve tê avakirin e, ne yekî berfirehkirina eqarên xwe û fethê ye.

Leylika Qemer weke sîmboleke sînor

Me li jor hinekî behsa wê yekê kir ka piştî xiyanetê, Leylika Qemer çawa sînorek li ber talankeran danî, da ku xwe nêzî cenazeyê Ehmedê Şeng nekin. Li vir êdî Leylika Qemer ne tenê mehîneke dilsoz e, ew di heman demê de nîşaneke sînor e jî, sînor diyar dike. Ew nahêle wê bi xwe bigirin û bibin, û ew nahêle ku siwarên Gêsan xwe nêzî cenazeyê Ehmedê Şeng jî bikin. Bi vegera xwe ya Çiyayê Evdilezîzê bi tena serê xwe, ew hem cerda vegerandina talanê mumkin dike û hem jî Dodikiyan dibe ser cihê ku cenazeyê Ehmedê Şeng lê ye. Belkî nîşana Leylikê ya herî mezin di vê sînordanînê de ew e ku ew sînor ji serketina xiyanetê re datîne. Leylika Qemer ji bîr nekiriye ka kê bi xiyanetê Ehmedê Şeng kuştiye û wî xayînî yanî Sergêsê Gêsî piştî ku benê xwe diqetîne, ji binê kon dikişîne û dikuje. Em dikarin bibêjin ku Leylika Qemer weke dewameke zindî ya erdên Dodikiyan e, lewma ew bîreke rewa û heq a xwedîtiya wî erdî nîşan dide. Jixwe, bi awayekî xwezayî berê wê li Çiyayê Evdilezîzê ye û ev yek jî vê hêza wê ya sîmbolîk a elaqedarî çiyê nîşan dide.

Sînorên qewmî neyekser lê zelal in

Herçî sînorên di navbera qewman de ne, neyekser jî be zelal hatine îfadekirin. Vegotina epîk a vê destanê di şîfrekirinê xwe de eşkere nîşan dide ku Dodikiyên Kurd xelkê çiyê ne û girêdayî keramet û anora xwe ne. Beramberî wê, Gêsan ê Ereb xelkê çolistanê ne û aboriyeke wan a xwe disipêre talakeriyê heye. Ji ber wê ev sînorên qewmî di heman demê de weke sînorên di navbera cudatiyên aborî, ekolojîk û exlaqî de jî xwe diyar dike. Bi her halî jixwe ji destanê em tê digihîjin binpêkirina bi qest a van sînoran rê li ber bûyerên giran vedike ku em dikarin weke felaket jî bi nav bikin: Bi sedan siwarên Gêsa tên kuştin û mezinê Dodikiyan Ehmedê Şeng jî tê kuştin.

Li şûna encamê

Destana Ehmedê Şeng weke vegotineke epîk behsa şerekî di navbera du eşîran de nake, ew nihêrîneke li dinyayê ya diyar şîfre dike. Di vê nihêrîna li dinyayê de Çiyayê Evdilezîzê welatê Kurdan û eşîra Dodikiyan e. Herçî Gêsan in, li wir tenê weke mêvan rewa ne. Gava Gêsan li talanê Dodikiyan dixin, ev dibe binpêkirina sînor her wiha di warê cografî de jî. Bersiva Ehmedê Şeng û paşê mêrxasên Dodikiyan Kose Etman, Kose Neman, Kose Şahîn û Osman esas li vir ji bo jinûveavakirina sînorê heyî ye. Hem Ehmedê Şeng û hem jî ev mêrxas xwe ji tinekirina bi temamî ya Gêsan didin alî û ev jî nîşan dide armanc li vir ne berfirehkirina sînor, lê jinûveavakirina sînorê weke mekanê danûstandina di navbera eşîran - Kurd û Ereban- de ye. Yanî tolhildaneke ji bo tinekirinê em nabînin, tolhildana ji bo Ehmedê Şeng bi xwe jî ne ji bo tinekirinê ye, ji ber ku Dodikî li zarok û jinan tên rehmê.

Bi vî rengê xwe, em dikarin bibêjin, ev destan weke qanûneke yan jî hiqûqeke eşîrî karîger e, sînorên Dodikiyan beramberî Gêsan rewa dike bi cografya, adet û naratîveke dadê. Ev sînorê hanê yê tê danîn, weke mekanekî hatiye sêwirandin ê ku li ser danûstandin di navbera du komên eşîrî û qewmî ji hev cuda de bi rê ve biçe. Bi awirê Kurdan, ev dibe destaneke mêrxasî û kerameta eşîrî beramberî talankeriya eşîrên çolistanê yên weke Gêsan. Mirov dikare vê destanê tevî destana Dewrêş/Derwêş û Edûlê jî bixwîne û wê destanê jî di çarçoveyeke dewamîbûneke dîrokî de çêtir analîz û şirove bike.

** Albert Socin, ev berhem sala 1870'yî li Zaxoyê berhev kiriye. Binihêre li (Socin 1890: 201-214). Ji bilî variyanta jor a Socin berhevkirî, ez rasta variyanteke ku Hesen Elî Xencer dibêje jî hatim. Lê belê divê nivîsê de ez ê xwe bi tevahî bisipêrim variyanta Socin ji herêma Botan berhevkirî.*

*** Barth esas vê helbestê ji bo xurtkirina argumana xwe bi kar tîne, lê min temamê ferdaya destpêkê û dawiya helbestê neqand, tercîhên wî guhertîne (Barth 2000: 28).*

Çavkanî

Barth, Fredrik (ed.). (1969). Ethnic groups and boundaries: The social organization of culture difference. Boston: Little Brown and Company.

(2000). Boundaries and Connections. di nava: Antony P. Cohen (ed.), Signifying identities: Anthropological perspectives on boundaries and contested values. rr. 17-36. London: Routledge.

Socin, Albert. 1890. Kurdische Sammlungen, zweite Abteilung, Erzählungen und Lieder im Dialekte von Bohtan. Sankt Pêtêrsbûrg: Eggers et Comp.

Helbestek ji destanekê re

Akademîsyen, nivîskar û şair Selîm Temo li ser 112 hespên qehremanên dîrokî û epîk ên Kurdan şiirên bedew nivîsandin û tevî xezelekê jî ew weke kitêb sala 2023'yan weşandin*. Wî weke nêzîkbûn û dûrketina hespan ji mekanekî, yan bi yek ristê dest pê kir û ferdayên xwe gihandin pênc ristan, yan jî ji pênc ristan dest pê kir û ferdayên xwe li yek ristê sekinandin. Di nava hespên wî de mehîna Ehmedê Şeng, Leylika Qemer nebû. Min xwest hem ji bo qehremaniya epîk a Ehmedê Şeng û hem ji bo dilsoziya epîk a Leylika Qemer, diyalogeke min a kurt bi 112 hespên Selîm Temo re hebe. Min Leylika Qemer bi dûr ve meşand yanî bi pênc ristên ferdayê dest pê kir û li yekê sekinand. Leylik hem behsa mêraniya Ehmedê Şeng dike, hem behsa mêrkujî lê ne qatilbûna xwe dike û hem jî qeda li xiyaneta Sergêsê Gêsî dibarîne.

■ "Ax Sergêsê Gêsî kevne xulamo, te çima xwe avêt bextê min Ax Ehmedê Şeng te çima bextê min da wî bêbextî, weyla li min



113 Leylika Qemer

Car ne tenê car e,
car zeman e yê dizane jixwe dizane
Ne ku ez tolhildêr im,
ne ku qatil im, erê mêr kuştin min
Çawa tîna min wekî din bişikesta,
hedana min bihata, pirzane?
Çawa ez girêdayî bimama li binê xêwetê,
li aliyê odê çavên min?
Sergêsê Gêsî rûne, bixwe,
vexwe li ser mehfûrên te bi paldane

Ez mêrkuj im,
lê ne qatil, tu jî mêr, mêrekî çê Ehmedê Şeng
Heft rojan nanê te xwarin,
li ser mehfûrên te rûniştin, ez bibilînim
Xatûna te xizmeta wan kir,
kêşa cefa, wan li talanê te xist bê deng
Te pirsî çima tu gehgeriyê dikî,
ma wekî din çawa dewsê hilînim?

Tu li ber Gêsan sekiniyî,
te got, ez Ehmed im, Ehmedê dîn im Te biland,
ez teng û baletengê Leylika Qemer dişidînim,
Te çi şer kir! Te sed mêrên Gêsan avêtin erdê,
ez ê car din nebînim!

Ax Sergêsê Gêsî kevne xulamo,
te çima xwe avêt bextê min
Ax Ehmedê Şeng
te çima bextê min da wî bêbextî, weyla li min

Xayinî ne marê kor e, tîremar e,
min dît li depa sînga te ket û çikiya rim

* Temo, Selim. 2023. 112 hesp û xezelek. Weşanên Dara: Amed.

Şerê Seîd Begê Dasinan

Moltke û Bedirxan Begê êrişî Keleha Ridwan dikin

Seîd Beg wek serokekî herêmî yê Êzîdîyan, bi rola siyasî, civakî û sembolî rabû. Di wê demê de di navbera dewlet û serokên herêmî de arîşeyên di asta rûxînê de hene û Seîd Beg wek nîşaneya berxwedan û parastina civaka xwe hate naskirin.

Bedirxan Beg

Dilber UMER*

Bûyerên sala 1838'an li herêma mîrîtiya Dasinan û devera çemê Ridwanê, yek ji bûyerên giring ên dîroka Kurdistanê ye, ne xasim jî ji bo civaka Êzîdî. Ev bûyer di şert û mercên siyasî û leşkerî yên sedsala 19'an de çêbûn, demeke ku dewleta Osmanî bi şertên nû yên navendîkirinê û kontrola herêman, hewl da ku desthilatdariya xwe li ser mîr û serokên herêmî zêde bike (Van Bruinessen, 1992, rr. 170–175 û(Fuccaro, 1999, rr. 20–25). Bedirxan Beg, weke aktorekî herêmî yê xurt, di navbera fermana Osmanî û armancên xwe yên mîrîtîyê de cih girtibû (Layard, 1849, rr. 160–165).

Di nav van şertan de, Seîd Beg, weke mîrê Dasinan, yek ji kesayetên sereke yên civaka Êzîdî, di nav çavkaniyên dîrokî de wek mîr, serok û sembolekî berxwedanê hatiye nîşandan (Rich, 1836, rr. 90–95).

Devera Ridwanê ne tenê cihê şer û têkoşînê bû, lê her weha ew cihekî welê bû yê ku tê de guhertinên dîrokî bi awayekî zelal xuya dikirin. Em dinava çavkaniyên dîrokî de nameyên şêwirmendê eskerî yê Prûsyayî di nava artêşa Osmanî de jî tên (Von Moltke, 1845, rr. 45–48).

Bûyerên sala 1838'an li devera Dasinan û çemê Ridwanê, çawa di navbera siyaseta dewleta Osmanî, rola Bedirxan Begê û serokatiya herêmî ya Seîd Begê de pêk hatin û çawa di çavkaniyên dîrokî de hatine nîşandan, em ê niha berê xwe bidinê. Ji bo vê jî ev pirsên hanê wê alîkar bin:

Seîd Beg kî bû û bi kîjan rola siyasî, civakî û sembolî di nava civaka Êzîdî ya Dasinan de rabû?

Bedirxan Beg di çarçoveya siyaseta Osmanî ya sedsala 19'an de çawa tê dîtin û bandora wî li ser bûyerên li Dasinan û Ridwanê çi bû?

Siyaseta dewleta Osmanî ya navendîkirinê di salên 1830–1840'î de çawa şertên şer û têkçûna li herêma Dasinan amade kir?

Devera çemê Ridwanê çi giringiya cografî û stratejîk hebû ku ew bû cihê şer û têkoşînê?

Çavkaniyên Elmanî û gerokên Ewrûpî bûyerên 1838'an çawa nîşan dane û em çi cudahiyê di navbera belgeyên Osmanî û folklora Kurdî de dibînin?

Stranên dengbêjan û çîrokên gelêrî, gelo bûyerên elaqedarî Seîd Begê û şerê Dasinan çawa parastin, guhertin û ev çawa dikare bi belgeyên dîrokî re li ber hev were girtin?

Rûdanên siyasî û guhertinên herêmî

Di sala 1838'an de, dewleta Osmanî di bin desthilatdariya Sultan Mahmud II (1808–1839) de bû. Ew dem, yek ji demên herî giring ên guhertinên siyasî yên dewleta Osmanî bû. Hingê desthilatdariyê bi awayekî fermî hewl da ku strukturên adetî yên herêmî (mîr û beg) bişikîne û wan bi rêveberiya navendî ve girê bide. Ev polîtîkaya ku bi navê navendîkirinê tê zanîn, mercên ku li herêman bi şer were sepandin, amade kirin (Van Bruinessen, 1992, rr. 170–175).

Di heman demê de, dewleta Osmanî bi gefeke mezin re rû bi rû bû, serhildana Mihemed Elî Paşa ya Misrê zexteke mezin lê dikir. Dewleta Osmanî bi awayekî rasterast neçar bû ku hêza xwe li nav herêmên dûr zêde bike û bi kesayetine herêmî yên bi hêz ên weke Bedirxan Begê hevbendiyên bi şert û merc ava bike (Van Bruinessen, 1992, rr. 168–176).

Di vê çarçoveyê de, Bedirxan Beg wek kesayetekî herêmî yê ku dikare asayîş û kontrolê li Botan û derdorê wê bi rê ve bibe, ji aliyê Osmaniyan ve wek alîyekî stratejîk hate pejirandin. Lê ev pejirandin bi şert bû: Bedirxan Beg divê herêmên ku li dora Botanê ne û wek biguman têne dîtin (weke herêmên Êzîdiyan û devera Xerza), bi hêza zorê bike bin kontrolê (Layard, 1849, rr. 160–165).

Herêmên Dasinan û Şêxan ên ku xelkê wê û mîrên wê Êzîdî bûn û bi şertên xwe yên olî û civakî ji strukturên Osmanî cuda bûn, di vê şertê de wek herêmên xeter hatine nîşandan.

Bi vî awayî, şerê Dasinan, encama sê şertên bi hev ve girêdayî bû:

1) Şertên navxweyî yên dewleta Osmanî: Merkezîkirin û reform; serdema tanzîmatan.

2) Şertên derve yên geopolîtîk: Gefa Mihemed Elî Paşayê Misrê.

3) Şertên herêmî: Rola Bedirxan Beg û herêmên Êzîdiyan.

Bêdengî bi xwe jî belgeyek e. Ew nîşan dide ku bi şert û mercên dijwar ka çawa folklor tê qutkirin. Dema ku em lêkolînên li ser Dasinan ji aliyê dîrok û wêjeya gelêrî ve bi hev re bixwînin, belgeyên nivîskî bi têgihiştina bêdengiyê ya wêjeya gelêrî temam dibin.

Mîrîtiya Dasinan beriya Şer

Berî ku şerê sala 1838'an li devera Dasinan û çemê Ridwanê bi awayekî fermî dest pê bike, herêm di bin mercên têkçûna siyasî û leşkerî de bû. Polîtîkaya navendîkirinê ya Osmanî, şertên fermî çêkirin, Bedirxan Beg ew şert bi hêza xwe ya herêmî bi pratîkê sepand, û civaka Êzîdî, bi serokatiya Seîd Begê, di navbera têkçûn û berxwedanê de ma.

Seîd Beg wek serokekî herêmî yê Êzîdîyan, ne tenê bi rola siyasî lê her weha bi rola civakî û sembolî jî rabû. Di wê demê de ya ku navbera dewlet û serokên herêmî de arîşeyên di asta rûxînê de hene, Seîd Beg wek nîşaneya berxwedan û parastina civaka xwe hingê hate naskirin (Rich, 1836, r. 90–95). Devera Ridwanê bi taybetî ji ber şertên cografî û stratejîk, bû cihê ku şer lê qewimî (Layard, 1849, rr. 160–165).

Bûyerên di dema şer de

Di dema şerê 1838'an de, Osmanî û hêzên girêdayî Bedirxan Begê, hewl dan ku herêmê bi awayekî fermî kontrol bikin, lê li aliyê din civaka herêmî, bi serokatiya Seîd Begê, berxwedanek nîşan da. Şer li devera Dasinan û çemê Ridwanê ne tenê şerê leşkerî bû, lê her weha şerê desthilatdariyê û nasnameyê jî bû.

Çavkaniyên cuda bûyeran bi awayên cuda nîşan didin:

Belgeyên Osmanî vî şerî, weke tedbîreke asayî û fermî nîşan didin.

Folklor û stranên dengbêjan jî vî şerî weke tra-

Şervanekî Êzîdî

jedî û berxwedanê şirove dikin, hem ji bo aliyê Seîd Begê û hem jî ji bo aliyê Bedirxan Begê.

Çavkaniyên Elman û Ingilîz, li gorî wezîfeya kesê nivîskar, şertên şer bi awayekî ku alîyekî sêyem bin rave dikin, lê belê ew bi çavê nasnameya wan a koloniyalîst hatine nivîsîn (Weke nimûne binihêre li Von Moltke, 1845, rr. 45–48)

Encama şerî û bandorên piştî şerî

Piştî şerê 1838'an, herêm di bin şertên guhertineke mezin de ma. Li aliyê Osmaniyan, ev şer wek serketineke fermî hate nîşandan, lê li aliyê civaka Êzîdî, ew wek şikestin û birîneke dîrokî di bîra komelî de cih digire. Desthilatdariya herêmî kêm bû - ya Êzîdiiyan li Dasinan şikest-, kontrola Osmanî zêde bû, û folklor bû alava sereke ya parastina bîra bûyeran (Fuccaro, 1999, rr. 30–35).

Neguncawbûna mercên parastinê (piştî şer) bi awayekî tund xuya bûn, herêma Dasinan têk çû, koçberî, kuştin, têkçûna malbatî ji encamên şerî bûn û mercên ku herêm were parastin jî neman.

Bêdengiya beramberî şerê li dijî Dasinan

Em ji sernavê jor yanî Bêdengiya beramberî şerê li dijî Dasinan, pê dihisin ku şerê Dasinan ê 1838'an tevî giringiya xwe ya dîrokî û civakî jî di wêjeya gelêrî ya Kurdan de zêde nehatiye dîtin, û qet nebe îro em nabînin. Bêdengîya wêjeya gelêrî li vir ne bi wateya nebûna îcrayan e; lê em bahsa kêmbûna stran, kilam, çîrok û gotinên gelêrî yên tomarkirî yên li ser vî şerî dikin.

Yanî maneya bêdengiyê li vir em dikarin wiha rave bikin: Ne ku bûyer qet nehatine gotin, lê di koçk û dîwanên dengbêjan de bi gewde nebûne weke stranên şer, kilamên serhildanê, destanên xwecihî.

Gava em behsa wêjeya gelêrî jî dikin, em behsa pergalên gotinî û hûnermendî dikin yên ku gel wan bi stran, çîrok, qewl, gotinên rojane dibêjin û ew jî bûyerên mezin şirove dikin.

Herçî wêjeya gelêîr ya li ser bûyerên Dasinan e, bi kilamên dengbêjî kêm hatiye tomarkirin, bêhtir weke çîrokên gelêrî, gotinên bîranînê û şêwazên belgeyî hatiye veguhastin.

Em ji xwe bipirsin ka çima em dengê şerê Dasinan di wêjeya devkî de nabihîsin? Bi ya min yek ji sedeman zor û têkçûn e: Şer û peyama wî bi şertên tund (kuştin, koçberî, talan) çêdibû. Sedemeke din jî kontrol û têkoşînên siyasî bû: Di şertên dewleta Osmanî û aktorên herêmî de, gotina gelêrî tê sînordarkirin yan jî tê şikandin.

Sedemeke din jî dikare guhertina navenda wêjeya gelêrî be: Hin bûyer bi navê kesayetên din (mîr, serok, şerên Botanê) di destanên din de hatine gotin, lê Dasinan bi navê xwe kêm xuya bûye. Weke sedemeke din em dikarin behsa guhertina cîhana gotinê bikin: Bûyerên di şerê Dasinan de zêdetir di belgeyên dîrokî de (rêwîtiyên Ewrûpiyan, rapor, bîranîn) de mane, ne di gotinên gelêrî de.

Li vir dikarim behsa wê yekê bikim ku Luqman Guldivê ji min re got, wî îcrayek ji nava şairên Goyan sala 2003'yan berhev kiriye. Gava wî şair razî kiriye ku vê îcraya li ser Seîd Begê bibêje, şair gotiyeû ew naxwaze êdî van îcrayan bibêje ji ber ku ew behsa şaşiyên berê, dijminatiya di navbera Misilman û Êzîdiyan de dike. Ev jî nîşan dide ku bîrewe-riya welatparêziya Kurdan û neteweperweriya wan jî dibe sedem ku ev îcra êdî zêde neyên gotin.

Helmut von Moltke

Di encamê de bêdengî xwe bi xwe jî belgeyek e. Ew nîşan dide ku bi şert û mercên dijwar ka çawa folklor tê qutkirin. Dema ku em lêkolînên li ser Dasinan ji aliyê dîrok û wêjeya gelêrî ve bi hev re bixwînin, belgeyên nivîskî bi têgihiştina bêdengiyê ya wêjeya gelêrî wê temam bibin. Heke kilam û çîrok kêm in, şiroveya bêdengiyê xwe bi van pirsan digihîne jînwarekî zanistî: Çima nehatine gotin? Kê/Çi bêdeng kir? Di kîjan şertan de ev bêdengî çêbû?

Weke encam

Ev kurtelêkolîn diyar dike ku bûyerên sala 1838'an li herêma Dasinan û devera çemê Ridwanê, ne bûyerên hêsan û bi yekaliyî bûn, lê encama têkiliya şert û mercên siyasî, herêmî û civakî bûn. Polîtîkaya navendîkirina dewleta Osmanî di nîvê yekem ê sedsala 19'an de tevî siyaseta reformên tanzîmatê, şertên ku desthilatdariya serokên herêmî were sînordarkirin amade kirin. Di vê çarçoveyê de Bedirxan Beg weke aktorekî herêmî yê bi hêz di navbera fermana Osmanî û armancên xwe yên siyasî û desthiledarî de bi roleke giring rabû.

Seîd Beg, di bîra komelî ya Êzîdiyan de weke sembola rûmetê û lê her wiha şikestinê ma, û ev bîranîna komelî, her çend ne bi kilamên dengbêjî, lê bi şêwaza bêdeng a wêjeya gelêrî heta îro jî tê veguhestin. Ji bo serwextbûna li bûyerên weke şerê Dasinan, pêdivî ye ku wêjeya gelêrî ne bi şertê ku bi stran be, lê bi şertê ku weke şêwazekî bîra komelî û veguhestina têgihiştinê be were fêmkirin.

Çavkanî

Ak, W. (Amadekar) (2016). Çil Kelatên Kurdistanê, Çîrok, Awaz û Stran. Van: Şaredariya Bajarê Mezin.

Fuccaro, N. (1999). The Other Kurds: Yazidis in Colonial Iraq. London: I.B. Tauris.

Layard, A. H. (1849). Nineveh and Its Remains (Vol. I). London: John Murray.

Rich, C. J. (1836). Narrative of a Residence in Koordistan (Vol. II). London: James Duncan.

Van Bruinessen, M. (1992). Agha, Shaikh and State. London: Zed Books.

Von Moltke, H. (1845). Letters on the Conditions and Events in Turkey. London.

** Xwendekara bernameya mastera Ziman û Wêjeya Kurdî li Zanîngeha Kobanê*

Dem dema avakirina Jiyana Azad e

Zagros HÎWA

Rewşa Îranê her ku diçe aloztir dibe. Pergala desthilatdar a kû li ser Îranê hukim dike, hem ji aliyê gelên Îranê û hem jî ji aliyê hêzên navdewletî nayê pejrandin. Ev pergala ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekemîn hatiye damezrandin û di sala 1979'an de rengêkî dînî li xwe kir, êdî ne dikare ji daxwazên gelên Îranê re bibe bersiv û ne jî dikare li gel pergala cîhanî bibe yek. Ji ber vê yekê, rewşa Îranê her ku diçe ber bi teqînêkê ve gav diavêje.

Gelên Îranê xwedî paşxaneyeke pirr dewlemend a felsefî, çandî û dîrokî ne. Ev gel zû bi zû zordarî û zordestiyê napejirînin û her tim ji bo azadiyê têkoşiyane. Di dîrokê de gelek kesayetên weke Babek, Mezdek, Ebu Muslîmê Xorasanî, û wekî din li dijî zordariyê li dijî desthilatdaran têkoşiyane. Di dîroka nêz de jî gelên Îranê hem li dijî pergala paşatî -şahî- û hem li dijî pergala olperest rabûne. Gelên Îranê her tim ji bo demokrasiyê û azadiyê di nava têkoşînê de bûne û di vî warî de gelek berdêlên giran dane. Em dikarin bibêjin, di serdema nêz de yekem bihara Rojhilata Navîn di sala 1979'an de li Îranê çêbû. Lê çawa kû hêzên navdewletî bi rêya DAIŞ'ê bihara Ereban ji rê derxistin û kirin bela li ser tevahiya mirovahiyê, bihara gelên Îranê jî bi rêya Ayetollayan ji rê derxistin û kirin belayek li ser gelên Îranê hemûyan. Bûna desthilat a Xumeynî weke dij-şoreşekê bû li dijî rabûn û serîrakirina gelên Îranê.

Her car xurttir ji berê

Ji sala 1998'an û pê ve, gelên Îranê bi pêşengtiya jin û ciwanan li dijî sîstema Ayetollahan di nava berxwedanê de ne. Her kû dijmin berxwedanekê ditepisîne, berxwedan û rabûna piştî wê pirr mezintir çêdibe. Weke mînak, piştî kû berxwedana "Jin, Jiyan, Azadî", bi rêya bikaranîna tundûtûjiyê û heta bi çekên kîmyewî li dijî jinên ciwan hat tepisandin, vê carê di sala 2025'an de gelên Îranê raperîneke mezintir li dar xistin û bingehên esasî ên rejîmê hejandin. Taybetmendiya herî sereke ya vê raperîna dawî ew e ku çîna "bazirgan" pêşengtiya wê kir. Çîna "bazirgan" ew çîn e kûu heta niha rejîmê xwe bi wê li ser pêyan girtibû. Ji ber vê yekê rejîma Îranê di rojên 8-10'ê Çileyê îsal de bi awayekî hovane êrişî gel kir, komkujiyeke mezin pêk anî ku di dîroka nêz û dûr a Îranê de mînaka wî tine ye. Ev komkujiya ku rejîma Îranê li ser millet da meşandin, ji komkujiyên DAIŞ'ê bi dehan caran mezintir e. Li gorî hin çavkaniyên ji nava Îranê di nava 2 rojan de zêdetirî 30 hezar kesan hatine kuştin û zêdetirî 70 hezar kesan jî hatine birîndarkirin. Hê jî bi hezaran kesên girtî, metirsiya bidarvekirinê li ser wan heye. Rejîmê, ji bo ku raya giştî a cihanê ji vê komkujiyê agadar nebe, înternet bi temamî qut kir û hê jî ev qedexe dewam dike.

Rejîm êdî ne rewa ye

Ev komkujî vê rastiyê radixe ber çavan ku ti rewayetiya rejîma Ayetollahan li Îranê êdî nemaye. Ev rejîm di qeyraneke kûr a îdeolojîk, civakî, siyasî, aborî û kultûrî re derbaz dibe. Ya eşkere ew e ku vê rejîmê êdî temenê xwe temam kiriye û eger bi-

mîne jî wê tenê bi riya tundûtûjiyê û komkujiyan bimîne. Ji derveyî rêjeyeke kêm êdî çi kes li Îranê vê rejîmê qebûl nake. Ev rejîm jî ji bo bimîne amade ye ku bi çavsorî her cureyê komkujiyan pêk bîne. Dîroka rejîma Îranê, dîroka komkujîyan e, bi komkujî, êşkence û bidarvekirinê xwe li ser pêyan digire. Lê li Îranê xelk azadiyê dixwaze û teslîm nabe. Ev komkujî mumkin e ku ji bo demeke kurt bandorekê bikin, lê rabûn û serîrakirina piştî wê, wê bi heybettir ji yêmn beriya xwe be.

Pêwîst e em wê xalê zelal bikin ku rejîma heyî ya

> **Dîroka rejîma Îranê, dîroka komkujîyan e, bi komkujî, êşkence û bidarvekirinê xwe li ser pêyan digire. Lê li Îranê xelk azadiyê dixwaze û teslîm nabe. Ev komkujî mumkin e ku ji bo demeke kurt bandorekê bikin, lê rabûn û serîrakirina piştî wê, wê bi heybettir ji yêmn beriya xwe be.**

Îranê bi destê hêzên derve hatiye destnîşankirin. Rejîmên beriya wê jî bi heman rengî bûn. Ingilîzan Reza Şah anîn Îranê. Dîsa Ingilîzan ew ji Îranê birin û heta mirinê li giravekê hiştin. Ingilîz û Emerîkiyan Mihemed Reza Şah anî ser desthilatdariyê. Ingilîz û Emerîkiyan, ji bo parastina Mihemed Reza Şah li hember Dr. Mihemed Musaddiq darbeya eskerî çêkir. Piştî kû serhildana gel cih li Mihemed Reza Şah teng kir, yên ku Xumeynî anîn ser desthilatdariyê jî her heman hêz bûn. Û heman hêz heta niha jî ev rejîm li ser pêyan hiştine. Kêra vê rejîmê ji bo DYE û YE'yê ew e ku dikare bi gotareke dînî, geşedanên demokratîk hemûyan li Îranê bitepisîne. Heta niha her ku gelên Îranê rabûne, hêzên derve li şûna ku alîkariyê bidin gel, alîkarî dane rejîmê. Ev bi eşkereyî di serhildana 2009 û ya 2022'yan de hate dîtin. Wan nedixwest ku rejîm birûxe. Ji ber ku ew hêz demokratîkbûna Îranê û Rojhilata Navîn naxwazin. Ew tenê li pey berjewendiyên xwe ne.

Gel azadiyê dixwaze Hêzên hegemonîk kara bêsînor

Sedema nerazîbûna gelên Îranê û hêzên derve li hember Îranê ne yek e. Her yek armanceke xwe ya cuda heye. Gelên Îranê, azadî û demokrasiyê dixwazin. Lê hêzên derve dixwazin ku sîstema Îranê, bi darê zorê yan jî bi rêya dîplomasiyê, li gorî berjewendiyên xwe careke din bi rêxistin bikin. Di çarçoveya Şerê Cîhanê yê Sêyemîn de hêzên hegemonîk ên cîhanê dixwazin ti astengî li hember gera sermayeyê û berjewendiyên wan çênebe. Ji ber vê yekê dixwazin tevahiya dewletên ku ne li gorî berjewendiyên wan hêza ne, di nava sîstema xwe de entegre bikin. Ti peywendiya van hêzan bi têkoşîna azadî û demokrasiyê ya li Îranê re tine ye.

Heger Îran li hember hêzên hegemonîk ê cîhanê şer bike, wê wenda bike, têk biçe. Ji ber ku hem weke paradîgma û hem weke aborî û serbazî, hêza wê têra berevaniyê nake. Ev mijar di şerê 12 rojan de xweşik diyar bû. Di demekê de ku hîmên rejîmê hemû tûşî darrizîn û hilweşandin bûne, ew nikare tenê bi teknolojiya xwe ya fuzeyan li hember hêzên hegemonîk bisekine. Heger Îran daxwazên hêzên hegemonîk ên dinyayê qebûl bike, ev ê bibe binketina wê. Ji ber ku Îranê stratejiya xwe hemû, li ser bingehê çekên atomî û hêzên wekîl ava kiriye. Heger dest ji wan tiştan berde, êdî ti hêza wê namîne ku xwe li ser pêyan bigire. Jixwe, di wan mijaran de ji sala 2020'an û pê ve, gelek derbên giran li Îranê hatine xistin.



Sê senaryoyên muhtemel

Niha ji bo destwerdana li Îranê behsa sê senaryoyên bingehîn tê kirin. Ya yekê, hilweşandina rejîmê bi rêya êrişên leşkerî û li ser textê desthilatê danîna Kurê Mihemed Reza Şah e. Ev bijarte, metirsiyên xwe ji bo hêzên hegemon heye. Ji ber ku mumkin e, nikaribin wê valatiya desthilatê dagirin. Gelên Îranê ku beriya bi 47 salan Mihemed Reza Şah qewitandin, niha naxwazin kurê wî ji nû ve bibe desthilat. Wekî din, hêzên hegemon ditirsin ku ji ber hilweşîna rejîma Îranê, sîstemeke demokratîk ava bibe ku daxwazên wan hêzan hemûyan qebûl neke. Em ji bîr nekin ku Tom Barak gotibû: "modela herî baş ji bo rojhilata navîn dîktatorên xêrxwaz in"!.

Senaryoya duyem, tasfiyekirina hin serkirdeyên rejîmê û danîna çend kesên alîgirê DYE û YE'yê li şûna wan e. Hêzên hegemonîk dixwazin vê yekê jî bi rêya operasyonên cerahî pêk bînin. Rejîma Îranê, niha tedbîrên vê senaryoyê girtine. Gelek kesên ku weke muhtemel e yanî potansiyeka wan heye ku bibin alternatîfa desthilata heyî, di zindanê de ne.

Senaryoya sêyem jî ew e ku rejîma Îranê weke xwe bimîne, lê daxwazên hêzên hegemon hemûyan qebûl bike. Rayedarine rejîmê, dizanin, heger sîstema wan hilweşe ti rêya jiyanê ji wan re nîne. Ji ber vê yekê, îhtîmal heye ku xwe teslîmê daxwazên hêzên hegemon bikin, di nava sîstema hegemon a navdewletî de entegre bibin û desthilata xwe dewam bikin.

Di vê pêvajoyê de ya herî giring ew e ka gelên Îranê û bi taybetî gelê Kurd, bêyî ku hêviyên xwe hemûyan bi destwerdana hêzên derve ve girê bidin, li ser bingehê dewamkirina li ser rêûresma şoreşa Jin Jiyan Azadî, karibin têkoşîna xwe ji bo demokrasiyê bilind bikin. Çawa ku di şoreşa Jin Jiyan Azadî de hate dîtin, gelê Kurd dikare ji guhertinên demokratîk û guhertinên zihniyetî u çandî re li Îranê pêşengitiyê bike. Di serhildanên herî dawî de jî gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê de li bajarên weke Kirmaşan, Îlam, Abdanan, Hemedan, Xorremabad, Melekşa de bi awayêkî herî aktîf beşdarî şoreşê bû. Êdî dema wê hatiye ku bi rêxistinbûna li ser bingehê Neteweya Demokratîk û Xweparastinê, pirsgirêka Kurd li Îran û Rojhilatê Kurdistanê çareser bibe. Dengê hilweşîna sîstema dîktatoriyê ya sed salî niha tê guhê her kesî. Dem dema avakirina sîstemeke demokratîk û jiyana azad e.

■ **Di vê pêvajoyê de ya herî giring ew e ka gelên Îranê û bi taybetî gelê Kurd, bêyî ku hêviyên xwe hemûyan bi destwerdana hêzên derve ve girê bidin, li ser bingehê dewamkirina li ser rêûresma şoreşa Jin Jiyan Azadî, karibin têkoşîna xwe ji bo demokrasiyê bilind bikin. Dengê hilweşîna sîstema dîktatoriyê ya sed salî niha tê guhê her kesî.**



ey pakrewan
ey birûsk qîza birûskan
ez ê hemû stêrkên li ezmanan
ji bo sedeqeya serê te
belav bikim ji dêvla xêran
ez ê hemû çiyayên çîçilaskî
bi dora serê te bigerînim
ji te re bikim qurban

(Rênas Jiyan)